



Danerê Rojnameya pêşî a Kurdî
Miqdad Mûhed Bedîrxan

Armanac

Hejmar, No: 130
Tebax
August 1992
Buha - Price
15 SKR, 3DM

Rojnameya Mehane

Dewletê Şirnex wêran kir



□ Ordiya Tirk 3 rojan dora Şirnexê girt, bi tank, panzer û topan seranserê bajêr bombebaran kir.

□ Rojnamevan piştî 3 rojan, bi şertê ku qumandarê Tugaya eskerî bi wan re be û bi kesên sivil re nepeyivin, li bajêr geriyar.

Şeva 18'ê mehê bi bahaneya ku PKK'ê êriş bîriye ser Şirnexê, dewleta Tirk 3 rojan bajar xist bin hesargê û ji noqteyên berê destnîşankirî, çî bête tev xaniyên bajêr, mal bi mal dan ber gulleyên tank û topan, bi helikopteran

□ Li gor agahdariyên nuh, ji xelkê sivil 20 kes hatine kuştin, 23 kes birindar bûne û 500 kes jî hatine girtin.

□ Konseya ewlekariya Milî û hukûmet di bin serokatiya T. Ozal de, 28'ê mehê li Diyarbekirê civiyar.

bombebaran kirin. Li gor beyanên Wezîrê Hundirkar Ismet Sezgin û waliyê Herêma Rewşa Îstisnayî Unal Erkan, elektrika bajêr hatiye birin, postexane hatiye xirakirin, şebeka avê hatiye şikandin, lewra jî li bajêr ne av, ne elektrik heye, ne jî telefon dixebitin.

Ji 18'ê mehê, heta 21'ê mehê hemû çûnûhatina bajêr, li bajêr bixwe jî derketina der hat qedexekirin. Roja Îniyê bi şertê ku ew rismên cihê ku qumandarê Tugayê nîşanî wan bide, bikşînin, rojnamevan ketin Şirnexê. Li gor nûçeyên rojnamevan ji herêma dişînin, ji kelexên (berate) pez û dewarên ku hatine kuştin, bîna genî ketiye bajêr, mirov nikare bîna xwe bigre. Hemû xaniyên bajêr bi gulleyan hatine hilweşandin.

Di 3 rojan de Şirnex, mal bi mal hat saxikirin. Bêyî malbatên milîsên dewletê, tev Şirnexî li meydana hatin topkirin û muamlecya êsîran li wan hat kirin. Zulma dewletê ewqas mezin bû ku xelkê hew tehemul kir di 25'ê mehê de tevî kesên ku berî du, sê rojan ji bajêr reviya bûn, xelkê bajar bi tevayî terk kir. Heta nuha

□ 20.000 kesan ji Şirnexê bar kirin. Bêyî hêzên dewletê û qorciyên mala Elîxan Tatar kes li Şirnexê nemaye.


□ Gundên Şilyan, Heştîyan û Gundik bi bombeyên balafiran hatin xirab kirin.

nêzî 20.000 kesî ji Şirnexê bar kirine, çûne Cizîrê, Silopî û Herzexê. Li dor 6, 7 hezar kes jî li binya Şirnexê, li gundê Dêrgulê ji aliyê eskeran ve hatine sekinandin. Xelk êşkere dibêje ku garantiya jiyana me tuneye, dewlet dikare her tim tiştê wiha bike hacet û xaniyên me bi ser serên me de bîne xwarê. Em li vê çolê dimirin, lê venagerin Şirnexê.

Li aliyê din, parlamenterên HEP'ê yên Şirnexê Mahmut Alinak, Orhan Dogan, Selim Sadak li ser daxwaza xelkê ji sefaretxaneyên 10 welatên rojava û ya Suriyê daxwaz kirin ku ew, xelkê Şirnexê wek multecî qebûl bikin. Xelkê Cizîrê, Silopî, Herzex û belediyên van bajarên ji bo hewandina Şirnexiyan dest bi kampanyayekê kirin, alîkarî civandin. Wezîrê Hundirkar Ismet Sezgin rexne li vê kirina parlamenteran girt û got: "Qonaxa dawî ya senaryoya Şirnexê ev senaryo bi şova ilticayê bi dawî hatiye." Yanî li gor Ismet Sezgin, ev 20.000 kesên ku Şirnex terk kirine, derewan dikin, tu zor û zul-

MITTERAND:

"Divê Kurd li Iraqek federal bigihîjin heqê xwe"



Roja 19'ê Tebaxê Serokê Fransa François Mitterrand bi Mesûd Barzanî û Celal Talebanî re li ser pirsra Kurd û Iraqê peyivîn.

Roja 19'ê Tebaxê, Serokê Fransa François Mitterrand bi hazirbûna wezîrên derve Roland Duma û Wezîrê Karûbarên Însanî Bernard Couchner re her du serokên Kurdan, Celal Talebanî û Mesûd Barzanî qebûl kirin.

Li gor rojname El Heyat a Lubnanî (20.08.1992) ku li Londonê derdikeve, M. Barzanî û C. Talebanî ev hevdişîna "pir baş" binav kirine. Li gor gotina M. Barzanî, Mitterrand gotiye Kurd miletekî "ezîm" e û piştgiriya welatê xwe tekîd kiriye û bi berdewam gotiye, ji bo berdewambûna parastina navnetewî ji bo gelê Kurd emê her tiştî bikin. Talebanî jî gotiye Mitterrand li ser heqê Kurdan li Iraqê federalî de sekinîye.


Li ser pirsra rojname El Heyat, ma tirsra we ji perçebûna Iraqê tune ye? Roland Duma weha bersîv daye: "Ev mesele girêdayî gelê Iraqê bi xwe ye, lê niha pêwîst e em ehemiyetê bidin rewşa gelê

Kurd û Şiiyan ku hukûmeta merkezî li hember wan muameleyek pir xirab dike. Mumkûne bi pêkhatina demokrasiyê li Iraqê ev problema çareser bibin. Lê belê ev tişt nuha li Iraqê tune ye û em nikarin ji niha de baweriya xwe bi dîtînen pêşin girêbidin."

Cardin li gor rojname, herdu serokên Kurdan li ser avakirina herêma bi emniyet ji bo Şiiyan jî sekinîne û ji Mitterrand daxwaz kirine ku herêma bi emniyet ku ji bo Kurdan hatibû tespîtkirin bête firehkirin ku hemû mîntiqa Kurdan bigre nav xwe.

Cardin li gor rojname Celal Talebanî û Mesûd Barzanî gotine em mutefiqin ku dewletek Erebi û li ser riyaya xwe Anqerê ziyaretkin.

Lê piştî çend rojan Mam Celal tenê çû Anqerê û M. Barzanî çû Sûriyê û roja 28'ê Tebaxê li Şamê bi Serokê Sûriyê Hafîz Esad re rûnişt.



Hevpeyvîn li gel Sekreterê Giştî yê PDK-î Dr. Seîd Şerefkendi:

Bi hemû riyên xebatê bawer bin û jê re amade bin

rûpel: 5

* * *

Hevpeyvîn bi parlamenter û wezîra jin re

Pirsên me pirsên Kurdistanê ne

rûpel: 6-7

Ehmed Huseynî Serpêhatiya Kulîlkên bejî

rûpel: 8

Vahap Kumruaslan Bersîva rojnamevanekî "çav mezin û guhdirejî"

rûpel: 9

Riza Polat: Riya Kurdistanê Başûr ne roniye

rûpel: 12

Rojeva Mehê

Çima "Hizbullah" ?

Ev nêzî salekê ye ku li Kurdistanê, teroreke nuh dest pê kiriye. Hêzek peyda bûye ku bi navê dîndariyê li gelek bajarên Kurdistanê, bi taybetî ji li wan bajarên ku tevgera milî di warê gelêrî de xurt û berbelav bûye, êrişên çekdarî dibe ser kesên welatparêz ên hişyar, ku di nav milet de ji wan tek hezkirin, li der û dora xwe xwedî însiyatîf in, di dezgehên gelêrî yên wek komele, partî û sendikayên legal de, yan li qeza, mehel û bajarên xwe dikarin xelkê li dora xwe bicivînin, bi zanebûn û maqûlî rê nîşanî wan bidin, bibin hêvî ji xelkê dora xwe re. Yan ji kesên wiha ne ku bi rapor û xeber û maqalên xwe, zilm û zora dewletê ya li ser miletê Kurd eşkere dikin. Mamoste ne, rojnamevan in, kesên siyasî ne û h.w.d.

Hêzek siyasî ya çekdar a dîndar ku navê wê Hizbullah e. Çima Hizbullah? Hizbullahî li welatên Musulman ên din, piştî ku hêzên Îslamî yên Şîî li Îranê di bin serokatiya Xumeynî de bi ser ketin û hukum xistin destên xwe, di nav civakên Şîî de hatin avakirin. Li kîjan welatî dibin bila bibin, bi rejîma Şîî ya Îranî ve girêdayî ne, li her welatê Musulman dixwazin rejîmeka Îslamî ya Şîî ava bikin. Li dijî dewletên Ewropa û tesîra wan a li ser welatên Musulman in, li dijî Xiristiyaniyê, Yahûdîtiyê ne. Li dijî layîsîzmê ne. Di çarçewa Musulmanetiye de ji li dijî hemû mezhebên Sunnî ne. Li dijî Alewîtiyê, Wehabîtiyê û hin mezheb û terîqetên çî Musulman û çî ne Musulman ên dinê jî ne. Dixwazin bir û bawerî û rêveçûnên Şîîyeyê li dinya Îslamî bikin serdest. Rejîma Îranî ya Şîî çî eşkera çî bi dizî li her welatî alîkarî û pişgiriya van Hizbullahan dike, ew jî Îranê wê merkeza xwe dizanin.

Hê di salên destpêka şoreşa Îranî ya Îslamî de, di nav Musulmanên Kurdistanê de jî hezkirinek jî ve rejîmê re peyda bû. Gelek dîndaran sempatiya xwe ji bo Xumeynî û hukûmeta wî diyar kirin. Di nav Kurdan de jî Hizbullahî peyda bûn ku propaganda rejîma Xumeynî kirin, têkilî bi ve rejîmê re danîn. Li dijî dewleta laîq (a ne Îslamî) ya Tirkîyê muxalefeta xwe diyar kirin. Îranê xwest îdeolojiya xwe di nav Kurdan de belav bike û bi ve riyê şoreşek Îslamî ya Şîî îxracî Tirkîyê bike. Ji ber ve yekê têkiliyên navbera Tirkîyê û Îranê ne xweş bûn. Heta di şerê navbera Îranê û Iraqê de Tirkîyê meyla xwe da ser Iraqê. Mixalîfên rejîma Îslamî ya Îranê li Tirkîyê hatin hewandin û gelek tiştên din.

Lê piştî demekê Musulmanên Kurd ên ku bi sempati ber bi rejîma Îslamî diçûn, dîtin ku ev rejîm ne dawa Îslamiyeta Sunnî lê ya Şîî dike. Bi ve yekê dest pêkirin xwe jî ve rejîmê dîr xistin. Ew hezkirina xurt a di nav Musulmanan de zû tefiya, ku hêzeka Hizbullahîyan di nav Kurdan de nema. Alewiyanê Kurd jî xwe bi carekê de meyla xwe nedabûn ser ve rejîma han.

Lê îro li Kurdistanê bi carekê de ji nuh ve Hizbullahî peyda bûne û li gelek bajar û deverên Kurdistanê zû bi zû belav dibin, bi teror û propagandayê xwe li gelek deveran nîşan didin. Lê tiştê heye ku ne tebîî ye. Ev Hizbullah ne wek Hizbullahên Îranî, ne wek yên welatên din û ne jî wek Kurden dixwazên rejîma Îranî yên kevn in. Erê ew êrişê dibin ser hin mele û dîndarên Musulman ên Sunnî lê eşkere eşkere propaganda Şîîyê nakin. Herçî bi eslê xwe xwe Kurd didin nasîn lê çî dîndar û çî ne dîndar dijinê hemû Kurdperweran in. Ne li dijî rejîma "bêdîn" a Tirkîyê ne, bileks êrişê dibin ser wan kes û hêzên ku li dijî dewleta Tirk in. Endam û terefdarên wan, gelek jê ne ew kesên dîndar ên bawermend in; diz, çeçel û berdûşên berê, niha bi navê van Hizbullahîyan daketina meydanê. Terorê, dikin, însanan dikujin lê dewlet berê xwe nade wan, bileks gelek caran qewimiye ku hêzên dewletê alîkariya wan kiriye, cinayetên wan veşartine, ew hewandine?

Xuya ye ku ev Hizbullah ne ji wan Hizbullahên ku em wan dinasin. Xuya ye ku dewletê bi xwe ev hêz durust kiriye û bi navê dîndarî û Hizbullahîyê daxistiye meydanê. Li bajarên Kurdistanê terora xwe ya ku naxwaze li ser navê wê bê hesibandin, di rîya ve hêzê re dide kirin. Dewletê bi zanebûn ev hêza terorîst bi navê Hizbullah daye avakirin.

Gelo dewletê çima hêzek siyasî ya bi vî awayî terorîst çêkir û çima bi nav (û heta dereceyekê jî bi îdeolojiya) Hizbullahîyê (bi îmaja Şîîyê) derxist meydanê?

Dewleta Tirk li ber çavê raya giştî ya dinyayê û bi taybetî jî ya cîhanê xwe wek dewletek demokratîk dide nasîn ku xwedêgiravî, îhtirama mafên mirovatiyê, azadiyan digre, li ser rîya heq, huqûq û edaletê dimeşe. Lê rastî, sedî sed berevaciya ve îddiyayê ye. Maf û azadiyên demokratîk bi cih nebûne. Miletê Kurd jî hemû mafên xwe bêpar e. Dewletê êrişeke dirindane dibe ser hêzên demokrasîxwaz. Şerekî nedîtî li Kurdistanê dimeşîne. Di meşandina vî şerê qirêj, êriş û terora xwe de gelek mixabin ku dewletê di raya giştî ya cîhanê de ji bo hin aliyên meşrûiyetek jî xwe re peyda kiriye. Mixabin ku bi piraniya raya giştî ya hundur û ya dervayî welêt daye qebûlkirin ku heqê wê ye û gelek tebîî ye ku hêzên çekdar ên dewletê bişîne ser muxalefeta çekdar ya Kurd û Tirkan. Eşkere îro em dibînin gava polîsên dewletê, ordî yan korîcî êrişê dibin ser endamên Dev-Sol'ê û wan di malên wan de dikujin, yan jî gava êrişê dibin ser hêzên çekdar ên PKK'ê û bi hovîti wan dikujin, ne jî Tirkan, ne jî ji raya giştî ya cîhanê dengê nerazîbûn û protestoyê bilind nabe. Tirk jî wan re li çepikan dixin û dinya jî dibêje, heqê dewletê ye, divê li hember terorîzmê dewlet xwe biparêze.

Lê muxalefeta dewleta Tirk, a ku serê wê dêşîne ne bes hêzên çekdar ên Kurd û Tirk in. Muxalefet û tevgerê gelêrî ya berfireh a neçekdar jî heye. Ev tevger jî a gelê Kurd e ku li gund û bajarên Kurdistanê berbelav e. Gava rewş wiha ye, dewleta Tirk bi rehetî nikare tevgera gelêrî ya Kurdistanê bi şerê çekdarî yê PKK'ê mehdût bike û hemû tevgerê bike terorîst. Ji aliyê din nikare tehamula hebûna ve tevgera gelêrî jî bike, sond xwariye ku wê bifetisîne, pûç bike. Lê dewletek ku îddîa demokratbûyîne dike, gelek peymanên navnetewî îmtiza kirine, welat jî mecbûrî li ber çavê dinyayê eşkere ye; bûyer zû bi zû nayên veşartin, li ve dewletê helbet ne

Dûmahîk r. 4

Ambargoya PKK'ê ji ya Seddam bi tesîrtir e:

Li Kurdistanê buhayî û birçîbûnê dest pê kir

Dijayetiya di navbera PKK'ê û hêzên Kurdîstana Iraqê de her ku diçe kûrtir dibe. PKK'ê di vî warî de gavek nuh avêt, êriş bir ser wan kamyonên ku mal û erzaq dikşînin Kurdîstana Iraqê. Piştî şewitandina sê kamyonan, şofêran dev ji mal kişandinê berdan. Li gor xeberên ji herêmê tîn, ji 19'ê Tebaxê û vir de ye hîn yek kamyon jî derbasî Kurdîstana Iraqê nebûye. Di delîlê ve ve şofêr edî rîya Sûriyê bi kart'înin; jî Nîsêbînê derbasî Sûriyê dibin û jî wir jî raste rast diçin Bexdayê. Vebûna ve rîya "nuh" feyde û rehetîyeke mezin da rejîma Seddam. Cimkî berê Kurdan, ji her kamyonê him gumruk digirtin û him jî mîqtarek mal jê vala dikirin. Nuha Kurd jî ve îmkane jî qut bûn. Berî rêbiriya PKK'ê, rojê nêzî 2000 kamyon jî deriyê Xabûr derbasî Kurdistanê dibûn.

Li gor beyanên mesûlên Cêpha Kurdistanê, ji ber ve "ambargoya" PKK'ê di nav gel de birçîbûnê dest pê kiriye û tiştên tîn diçûn jî sê qat buhatir bûne.

Ve ambargoya PKK'ê tesîra xwe li Kurdîstana Tirkîyê jî nîşan da. Ew kesên ku li ser rê, ji xwe re tesîs vekirine û debara xwe bi ve çûyî û hatina şofêran dikin, gişan jî bêkariyê ciyên karên xwe girtin. Xwediyê kamyonan jî jî bêkariyê nikarin teksîten kamyonên xwe bidin.

Li ser mesela ambargoya PKK'ê, Ş. B. Soreklî bi Celal Talabanî re hevpeyvînek kir. C. Talabanî jî ambargoya PKK'ê qebûl kir.

-PKK'ê rê girtiye, nahêle jî Kurdîstana Tirkîyê xwarin bê. Ev jî bûye sedema birçîbûneke berfireh. Çinku xelkê Kurdistanê tenê yek rîya wî heye ji bo ku xwarina kêma daxilî Kurdistanê bike û ev jî rîya Kurdîstana Tirkîyê ye. Lê waye PKK ew rê jî girtiye û bi vî karî jî Kurdistan xistiye bin blokadeke din, blokada sisîyan. Yek blokada cîhanê; dudu, blokada PKK'ê jî bakur; sisê, blokada Sedam Husên jî başûr. Blokada PKK'ê û ya Sedam tesîra wan pîr mezin e û herwiha bûye sedemê birçîbûnek bêsinor. Lê li alî din PKK'ê jî bakur rîya ew dahatuya ku ji kamyonan jî me re dihat jî qut kiriye. Loma rewşa Kurdistanê roj bi roj xirabûr dibe.

Li hember rexneyên ku ev rêbiriya PKK'ê zirareke mezin dide Kurdan û wan li hember Iraqê û Tirkîyê zêif dixîne, nûnerên PKK'ê îtiraz dikin û kirinên xwe yên di vî warî de diparêzin. Li gor ku rojnama **Yeni Ülke** (9-15 Axustos) nivîsiye, di 6'ê Axustosê de **berpirsiyarê ERNK'ê yê Rohhilata Navîn** beyanek daye û li ser "biryara ambargo ya ku PKK'ê li hember Kurdîstana Başûr girtiye", van dîtinên jêrin

aniye zimên:

"Ji alî Ordiya me ya Netewî ve girtina hin rîyan û hebûna kontrolê li ser wan rast e. Hin sebebên ve yê acil û bi heq hene." Bi kurtayî ew sebeb jî ev in: Têkiliyên hêzên Kurdîstana Iraqê bi MÎT'a Tirkîyê re hene, li Tirkîyê buro vekirine, deriyê Gumrika Xabûrê kirine deriyê şêlin û talanê, nahêlin erzaq ji Ordiya wan a Gel re here, welatparêzan bi komployan dikujin û bi Tirkîyê re jî li hember PKK'ê planên êrişê hazir dikin. Û hin rexne û îthamên din ên bi vî rengî.

Lê cardin di rojnama **Özgür Gündem** de (18 Axustos 1992) beyanek ERNK'ê ya din heye; ku li gor rojnamê ev beyan di 14'ê Axustosê de ji alî rêxistina ERNK'ê ya Ewropa ve hatiye belavkirin. Di ve beyana ERNK'ê de tê gotin ku "gava PDK-Iraqê abluqeya ku daniye ser rîyên Kurdîstana Başûr raneke, rê li ber xebata hêzên welatperwer bigre û nehêle Kurden Bakur û Başûr li ser sînor bê gumrik ticaretê bikin, wê ambargo bête domandin."

Wexta rojnama me ket çapê xeberên ku PKK'ê biryara rakirina ambargoyê girtiye dihatin.

Çilrojîya wefata Rewşena Bedirxanî

Di roja 11.07. 1992'an de li bajarê Banyasê, Şamê û Qamişloyê, Rewşen Bedirxan di çilrojîya wefata xwe de bi civînên girseyî hat bi bîranîn.

Li her sê bajarên bi sedan Kurd, nivîskar, nûnerên kovar û rojnameyên Kurdî jî bo bîranîna Rewşena Bedirxanî hatin ba hev. Li ser jîyan, xebat û nivîskariya Rewşen Xanimê gotar hatin xwendin, helbestvanên Kurd helbestên xwe pêşkêş kirin.




Bîstek ji koça dawî ya Rewşena Bedirxanî (Foto: Armanç)

Armanç
Rojnamê Kurdî ya mehane
Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon:
M. Elî
Zinarê Xamo
Hesen Mizgîn
Mîrza Bextiyar
Lewendî Firat
S. Rêving
M. Lewendî
Redaktorê berpirsiyar:
M. Elî
Berpirsiyarê beşê
Dimilkî: Malmîsanîj


Adres :
Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden
Telefon
46-8-803135
Telefax:
46-8-801825
Ansvarigutgivare:
Kurdiska
Demokratiska
Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

Abonetî
Prenumeration
Abonetiya Salekê
Li Skandinaviya
150 SKR
Maqam
Myndigheter
250 SKR
Li Ewropa
50 DM
Li derveyî Ewropa
40 \$
Anons/ilan
nîv rûpel/ en halvsidan
2500 SKR


Li Kurdistanê di 8 mehan de 8 rojnamevan hatin kuştin



Muxabîrê 2000'e Doğru yê
Diyarbakirê Halit Gungen



Muxabîrê Özgür Gündem yê
Kerceswê Yahya Orhan



Nivîskarê Özgür Gündem
Huseyin Deniz

Li Kurdistanê di cinayetên "meçhul" de di 8 mehên dawiyê de nêzi 300 kesî hatin kuştin. Cinayetên li dijî muxabîrên rojnamên "Yeni Ulke" û "Ozgur Gundemê" dom dikin û bi kuştina rojnamevanê "Ozgur Gundem" Huseyin Deniz, hejmara muxabîrên ku di van 8'ê mehên dawiyê de hatine kuştin, gihaşt 8 kesî.

Roj tuneke ku li Kurdistanê çend kes neyên kuştin. Bi taybetî li derûdora Diyarbakirê, Mêrdînê, Batmanê, Şirnexê, Sêrtê û Hekkarîyê kaosê mezîna heye û li van bajaran her roj çend kesên kuştin û qatîlên gişan jî meçhul in. Kesên ku bi van cinayetên tarî tînin kuştin, hinekên wan endamên Partiya HEP'ê ne û hinek jî kesên serbixwe ne. Lê piraniya wan berê di he'fsan de mane.

Di 8 mehên dawiyê de 6 muxabîrên rojnamên "Yeni Ulke" û "Ozgur Gundem"ê hatin kuştin û yek jî hat birîndarkirin. Her du rojnamevanên mayî jî yek yek kovara "2000'e Dogru" û yek jî yê rojnama Sabahê bû.

Rojnamevanên ku di 8 mehên dawiyê de li Kurdistanê hatin kuştin ev in: Halit Gungen, muxabîrê 2000'e Dogru yê Diyarbakirê, di 18'ê Sibate li Diyarbakirê hat kuştin. Cengiz Altun, muxabîrê Yeni Ulke yê Batmanê, di 24'ê Sibate de li Batmanê hat kuştin. Izzet Kezer, muxabîrê rojnama Sabahê di 23'ê Adare de li Cizîrê hat kuştin. Hafiz Akdemir, muxabîrê Ozgur Gundem yê Diyarbakirê, di 7'ê Hezîranê de li

Diyarbakirê hat kuştin. Mecit Akgun, muxabîrê Yeni Ulke yê Nisêbinê, di 20'ê Hezîranê de li Nisêbinê hat kuştin. Çetin Ababay, muxabîrê Ozgur Halk yê Batmanê, li Batmanê hat kuştin. Yahya Orhan, muxabîrê Ozgur Gundem yê Kerceswê (Gercusê), di 31'ê Tirmehê li Kerceswê hat kuştin. Huseyin Deniz, nivîskarê Ozgur Gundem di 9'ê Tebaxê de li Ceylanpinarê hat kuştin. Û muxabîrê Ozgur Gundem yê Diyarbakirê Burhan Karadeniz jî di 5'ê Tebaxê de hat birîndarkirin û nuha di nexweşxanê de ye.

Rojnama Yeni Ulke di rûpelên xwe de bêyî Mecit Akgun, ciyek fireh dide muxabîrên ku hatine şehîdkirin û wan bi giramî bi birîne. Qet qala M. Akgun nakin, li gel ku muxabîrê wan ê Nisêbinê bû. Di bir û raya giştî ya Kurdistanê de zanîn ku Mecit Akgun jî aliye PKK ve hatiye kuştin.

Kuştina Mecit Akgun, imkana propogandayê da serokwezîrê Tirkiyê Demirel ku ew durûtiyê bike û li ser cinayetên rojnamevanan van gotinan bêje; "tiştên ku tînin zanîn, yê tînin kuştin ne rojnamevan in, di şiklê rojnamevanan de

milîtan in. Di navbera wan de du bendî heye. Kes nikare bi min bide qebûlkirin ku dewlet cinayetên dike..."

Van gotinên Demirel, hindik bin jî tesîra xwe li ser hîn rojname û rojnamevanan nişan da. Mesela, di rojnama "Turkiye" de Altemûr Kiliç îddîayên Demirel yê li ser cinayetên rojnamevanan rast dibîne û di nivîsa xwe de êrişê dibe ser rojnamevanên wek Oktay Eksî û Altan Oymen ku ew dibêjin beyana Demirel ya li ser cinayetên rojnamevanan bêtalîhî ye.

Yên ku demegojiya Demirel zanin bi hêsanî fehm dikin ku Demirel Demirelê berê 12'ê Îlonê ye. Çawa berê 12'ê Îlonê digot ku; "kes nikare bi min bide qebûlkirin ku milîyetçî cinayetên dikin." Îro jî ew dibêje, kes nikare bi min bide qebûl kirin ku dewlet cinayetên dike. Lê Demirel bi gotina xwe, xwe jî dixapîne. Çendekî berê li merkeza Enqerê dewletê 5 kesên Dev-Solê di malekê de dan ber gullan. Û rezaleta herî mezî jî Wezîrê "Mafê Însanî" yê Tirkiyê, Mehmet Kahraman li operasyonê temaşê kir.

Kuştina rojnamevanan ne bele sebeb e. Piştî ku dewletê dît qanûnên ku derdixe nikare di jiyane de bi cî bîne -ku yek jî van, qanûna Sansor û Surgunê bû- îcar dest bi cinayetnan kir; bê qanûn û bê mahkeme ew rojnamevanên ku dixwazin hinekî rastiyê binivîsinin, dide kuştinê.

BOKAN

Di roja 17.07.1992'an de li devera Bokan, xelkê deverê ji bona ku nerazîbûna xwe li dijî hukûmeta Îslamî ya Îranê nişan bide daket nava bajêr û mitîngeke mezîna li bajêr çêbû. Hukûmeta Îslamî wek her car êriş bir ser xelkê; 20 kes hatin kuştin, nêzi 20 kesên jî birîndar bûn. Û jî 300 kesî zêdetir jî hatin girtin.

Cîgirê waliyê Azerbêcana Rojava, ku Bokan dikeve nav sinorên wê yê îdarî, di beyana xwe de gef li xelkê xwar û got ku: "Kesên beşdarî mitîng û grewan dibin, wê bînin girtin".

NEYNİK

RIYA KURDISTANA BAŞÛR NE RONÎ YE

Riza Polat

Kurdan, li Kurdistanê Iraqê berî çar mehên hilbijartinek azad û demokratîk çêkirin. Ji rojên propogandayê heta roja hilbijartinê maqûliyê û tēgiştinê baş dan xuyakirin. Lê mixabin carna maqûlî û tēgiştinê baş jî nikare rê li pêşîya mirov veke. Îro li Kurdistanê jî rewş weha ye. Siyaseta Kurdan hem jî bo pirsên hûndirî hem jî ji bo pirsên derveyî de di cî de ye, lê di cî de bûyin bi serê xwe nikare statuyê bide diyarkirin. Bê guman siyaseteke rasteqînî (rastehiz, waqefî) û helwestên baş wê roleke girîng bo Kurdistanê azad bilîze, lê wê serê xwe nekaribe her tiştî hel bike. Heger mirov bi gotineke vekirî bibêje, li Kurdistanê dinamîkên hûndirî wê nikaribin her tiştî hel bikin.

Unsûrê ku di vê pirsê de wê gotina dawiyê bêje çi ye? Bi rastî ne yek unsûr e, pir in;

Ya yekem ew e ku hêj Emerîka, Awrûpiyan û Ereban çareyek bo îdara merkeza Iraqê nedîtine û bi rastî jî ne pirsê hêsan e. Mumkûn e her kes jî bo çûna Seddam hemfikir e, lê di pirsê Iraqê çawan û wê kî yê bê şûna Seddam de hemfikirî tune.

Bê şik Emerîka, Awrûpa û Ereba wê nexwazin hukmekî ku giraniya Şiiyan tê de hebe, bê ser hukum. Hukmekî weha dikare Îranê li herêmê xurt bike û Xelîcê tēxe bin destê Îranê.

A duym Kurd nebin, tu aliyên din jî bo Iraqê demokrasiyê kamil naxwaze. Hebûna demokrasiyê li Iraqê ne li menfeeta welatên Ereban e. Iraqê demokratîk dikare li gelek welatên Ereba tevî hevîyê çêbike. Tirseke din jî a di dilê Emerîka, Ewrûpî, Ereban û Tirkîyan de ew e ku li Iraqê demokrasiyê pêk bê û hilbijartin çêbin, ne dîr e ku wek Cezayîrê hêzên îslamî û bi taybetî yê şîa bînin ser hukum. Ya rastî kes ne terefartê demokrasiyê ye li Iraqê.

A siyem welatên Ereban, Tirkiyê û Îranê wê nedin Kurdistanê serbixwe. Bê şik helwestên van welatên yekser tesîrê li Emerîka û li Awrûpiyan jî dike. Tu dewleteke Ereba ne terefart e ku Kurdistan jî Iraqê biqete. Ger heta îro hinek jî wan dewletan afîkariya Kurdan kiribe jî, ne ji bo ku bi rastî ew jî Kurdan hez dikin an jî aşîqên mafên mirovatiyê ne. Sedema esasî dijayetiya di navbera wan hukûmetan de bûye.

Îro rastiyê ku di rû daye ku tesîra şêla hinek welatên Ereba li cem Xerbê xurtir bûye. Ev jî mesela Ereba û Israîliya ye. Îro jî bo Emerîka û Xerbê helkirina pirsê Ereba û Israîl jî pirsê Kurdan û Iraqê muhîmtir e.

Bi taybetî piştî hilbijartinên Israîl û xurtbûna Îzaq Rabîn, îro di tereziya mesela Kurd de gotina Ereban jî gotina Kurdan girantir e.

A çaran jî ew e ku îro Kurdistanê fiilî li ber kepiyê Ereban, Tirkîyan û Îranê peyda bûye. Lê di rojên pêş de îstiqameta Kurdistanê fiilî ne diyar e ku wê bi ku de here. Wek li jor jî hatiye gotin cîranên Kurdan ên ku Kurdistan dagirikirine, wê nedin Kurdistanê azad û serbixwe durist be û di van şertan de lihevhatina Kurdan û Seddam jî ne diyar e. Ihtîmala çûna Seddam jî hewqasî ne xurt e. Ez texmîn dikim ku rewşa herî aloz jî bo Kurdan ew e ku Kurdan li welatê xwe jî bo demokrasiyê bê tîraşbûyî milvedane û bi rastî ne tenê milvedane, gav jî avêtine. Ji bo Kurdan pir zehmet e ku ew vê demokrasiyê bê tîraşbûyî bibin tēxin kirasê diktatoriya Seddam an jî diktatoriyeke din. Li Kurdistanê wê her kes dizane ji Partiya Komunist a Iraqê heta hêzên Îslamî, hemû partî ketin hilbijartinan. Û dîsa belkî di bîra her kesekî de ye ku di dema guftûgoyan de nesiheta Seddam jî bo Kurdan ew bû ku, tenya sê çar partiyên Kurdan hebin, ne zêdetir. Bi kurtî mirov dikare bêje ku rojên li pêşîya girava azadiyê, Kurdistanê ne zelal in.

Her çiqas di vê dawiyê de Emerîka gazî serokên Kurdan û ên muxalefeta Iraqê kir û bi wan re rûnişt jî, lê bi baweriya min tiştê jî nehat hel kirin. Rojnama û medya behs kirin ku xwedêgiravî Emerîka wê roketên Stînger bide Kurdan. Di rewşa îro de tiştê ku ji Stîngerê jî muhîmtir ewe ku statuya Kurdan wê çawan be û nêrîna Emerîka çi ye. Divê ku her Kurdek pê bizanibe ku wê roketên Stînger jî Kurdan rizgar neke.

Di vê meselê de Bush û îdara Emerîka durûtiyê dikin. Nuha li Emerîka hilbijartin hene. Demokrat jî Bush pirs dikin, dibêjin ku: We 700 hezar serbaz xistin Xelîcê û we nêzikî sed milyar dolar mesref kir, lê Seddam hîn jî li ser hukm e. Di hilbijartinê de bi rastî eva han di destê Demokratîkan de qozek e. Ji bo vê yekê Bush û îdara wî xwe mecbûr hîs dikin ku hin tiştê bikin. Lê ne ji bo helkirinê.

Min nexwest ku ez tabloyêke tarî raxim pêş çavên xwendevanan. Lê rastiya Kurdistanê ev e û ez hêvîdar im ku Kurd trajediya Mchabadê carek din neçin.

Banga Komela Rewşenbîrên Kurdên Ermenistanê

Ji detpêka salên 1950'î ve ye ku nûnerên rewşenbîrên Kurdên Ermenistanê û yê Yekitiya Sovyetê her firsend bi kar anîne ji bo ku guhdariya giştî deynin ser îzbatiyên pêpêskirina -saxlemkirina- mafên binociyên Kurd li Azerbêcanê. Rakirina Mintîqa Kurdistanê ya otonom, ku di navbera salên 1923-1930 de li vir hebû, rakirin û gelên wê muhacir kirin û yê mayî jî helandin. Xelatiyên li ser hejmara Kurdan, înkarkirina wê yekê ye ku Kurd li Azerbêcanê gelê etnik e, awayê nîgara siyaseta Azeriyan e li dijî Kurdan. Di nav van çar salên dawî de Kurdan gelek caran doz kirine ku Mintîqa Kurdistanê otonom li navenda Laçînê bê sekinandin.

Nuha firsenda dasekinandina Kurdistanê Sor saz bûye, gelek fen, fêl tene kirin ku daxwaza Kurdan şerpeze bikin. Ordiya


Azerbêcanê û mîletçiyên Azerî, mal û oxaxên birayên me bi gulbaranê tarîmar kirine, dixwazin wê rîya tek û tenê bigrin ku ji Ermenistanê diçe Qerebaxa Çiya.

Daxwaza me ew e ku problema Qerebaxê bi heqî û bi awayê pêşverû bê zelalkirin, helkirin, bi alîkarî û kontrola Kurdan û hêzên Koma Netewan, rîya Laçînê bi aştî her dem vekirî be, bê qal û ceng be.

Em bi hêvî û bawerî bangî komeleyên Kurdan yê li welêt û li derveyî welêt. rêxistinên demokratîk ên Kurdan dikin ku piştigiriya dasekinandina otonomiya navça Kurdistanê Sor bikin. Em bang dikin ku piştigiriya Kurdan bikin, problema vî erdî bi mirovhezî, bi qedirgirtina doza bixwe biryardana bextyaziya xwe bê safîkirinê.

Gerrek dîrokî li nav arşivan

Celîlê Celîl



Ji dîroka destpêka Tevgera Barzaniyan

Destpêk di hejmera berê de

2- Rapora qonsulê Rûsya Qeyseriyê yê bajarê Bexdayê li ser emeliyeta li dijî Kurdên Şêxê Barzan.

Bexda, 9'ê Adarê s.1914 N. 112

Ji min ra hurmet e ji departementa pêşin ra binivîsim, ku di 9'ê vê adarê de di bin N.111 de min jî baylozaxana Rûsya Qeyseriyê ya li Konstantînopolê ra li ser van tiştan nivîsiye:

Li ser rapora min a sirî ya 3'ê vê adarê ya di bin N 100 de jî we ra wek serdezêdekirinê dinivîsim:

Vê demê îdî bi baweriyê mezin dikarim bêjim, ku armanca tedarek dîtina eskeriyê li wilayeta Musilê û civandina eskeran li Rewandîzê, Akre û Amediyê her tenê emeliyate li dijî ŞêxêKurdan yê Barzanê. Ji min ra qedir bûye ku ji we ra binivîsim, wekî însiyatîfa vê emeliyatê jî destpêkê de ya waliyê Mûsilê Suleyman-Nazîf Bey e. Her ew bûye, ku hukumeta merkezî li ser ferzûna vê tevdirê daye bawerkinê.

Gava Şêxê Barzanê tedarekên wahayî mezin, ku li dijî wî dibin bihîst, namek ji Suleyman-Nazîf ra nivîsî, wî da bawerkinê li ser baweriyê xwe li himberî dewletê û da femkirinê, ku ji tedarekên emeliyatê ecêb maye. Di bersîva vê name da waliyê Musilê Şêxê Barzanêji bo bi hizûr vê yekê bêje dawetî Mûsilê kir. Lê Şêxê Barzanê jî tîrsa xwe, wekî wê bê girti-

nê, tişteki ku bêbingeh nebû, daxwaza wî qebûl nekir û dest bi tedareka xwe ya parastinê kir.

Bi çî hawayî li dijî Şêxê Barzanê kar bimeşînin, di vê pîrsê da dîtina Suleyman Nazîf Bey û ya serokqumandarê korpûsa 12'a Esed Paşê ji binî hev nedigirt. Esed Paşa li dijî emeliyatê bû. Wî dida xuyakirinê, ku ji dewletê ra rîya lihevkinê pirtir dest dide û gerek bi Şêx re li hev bîn, çimkî tesîra wî li ser eşîrên Kurdan gelekî mezin e û çêtir e ew esker li himberî Rûsyayê derxin, gava eleqetî di navbera wan da sert be.

Suleyman Nazîf Bey hişk li ser gotina xwe sekinî, ku hêz li himberî Ş,x rakîn û bona ku prestîja dewletê heta saxin nekeve, derseke baş bidine wî. Bi vî hawayî jî ewî gotina xwe gîhande Konstantînopolê û nerazîbîna xwe ji Esed Paşa da xuyakirinê, heya wî ew bi xayîniyê gunehkar kir.

Dîtina waliyê Mûsilê piştevanê unîonîstan ku gotina wî li payetextê bêtir bi nirx bû ya here rast hate Naskirinê. Ew yek ku Safvet Bey, qeymeqamê eskerê Turkiyê yê berê dijminê Komîtê* (binihêr rapora min ya 3'ê Adarê) tevî pîrsa Şêxê Barzanê dihat girêdanê, rê dane Suleyman Nazîf Bey, ku ew bi giranî daxwaza xwe bi cî bîne.

Tedarekên eskeriyê dom dikin: 300 esker ji alaya 108'an bi serokatiya bînbaşî Fehmî Efendî ber bi Rewanduzê bi rê ket; alaya

106'an ya ji 300 eskeran ji Suleymaniyê ber bi Koy Sencaqê bi rê ket û alaya 107'an ber bi Akre şandin.

Wek xuya bû, di emeliyatê de ji 1000'î zêdetir merî wê kom bin û wek tê gotinê, şer li dijî Şêxê Barzanê wê di navbera 15-20 Adarê de destpê bive.

Diyar e, Turk li wilayeta Musilê ji bo bilindkirina prestîja xwe dixwazin gavên hişk bavêjin. Nimûnek, piştî pevçûna Kurdên Dizdêyî (Dizeyî) û eşîrên Ereban yên ku di navbera çemê Zabê û bajarê Erbilê de hêwirîbûn, weliyê Mûsilê bi eskerê Turkan ber bi wan ve çû û çar gundên Kurdan wêran kir û çend muxtar jî kire zîndanê.

Bi gotina gotinbêjan xuya ye nerazîbûn de nava Kurdan da li himberî Turkan û hukumeta ku hatiye ser text, gelekî xurt bûye. Şik tê tune, ku emeliyeta li dijî Şêxê Barzanê wê ev nerazîbûn hîn bihêztir bike.

Cigirê Konsul M. Popov

Arşîva siyaseta Rûsyayê ya Der. Bingeha "politarkîv 1913-1914", girêka 363, rûpelên 82-83

(*) Komîte ji partiya "Îtîhad ve Terakkî" ra dibêje, ya ku di wan sala hukumet dagirtibû destê xwe.

Çima "Hizbullah"?

Destpêk r. 2

hêsane ku hêzên polis, ordî yan muxaberata resmî ya dewletê mudeteke dûr û dirêj, insanên sivîl ên bê çek bikuje, qetlîaman bike û xwe ji gunehkariya ber çavê dinyayê jî xelas bike. Eger çî dewleta Tirk wek ku li Şirnexê xuya bû, qetlîamên gelêrî jî daye ber çavên xwe, lê buhayê vê yekê gelek giran li ser wê rûdine. Ji dêla ku ras-te rast insanên sivîl bikuje û sergêji-yên mezin ji bo xwe peyda bike ku nikaribe ji bin vî barî rabe, rîyeke din daye ber xwe. Hêzek durust kiriye, ku ne resmî hêza dewletê ye. Gunehên wê raste rast li ser hesabê dewletê nayên hesabandin. Hêzek e siyasî ye, nihênî ye, wek hin hêzên din ew jî çekdar e. Ideolojiyek wê heye, ji ber vê ideolojiyê rahiştiye çek, kesên ne wek xwe dikuje. Navê vê hêzê jî Hizbullah e ku li ber raya giştî ya cihanî wek hêzek bi îranê ve girêdayî bû dîtin.

Ji alî din navê Hizbullahiyê û huviyeta Şîitîyê ku bi vê hêzê ve ye, ji hin aliyên din jî sebebê tercihkirina dewleta Tirk in. Hêzek di nav civatekê de gava ne resmî, li ser navê dewletê derdikeve, imaja serbixweyî û sivilîyê bide xwe, divê ideolojiya wê hebe. Li

Kurdistanê tecrubên dewleta Tirk nişan dane ku hêzek bi imajeka wiha nedibû ku ne li ser navê çepitîyê, ne jî li ser navê nasjonalîzmê derkeve. Gava bi van îdeolojiya derkeve, di rojên pêş de dikare bi wî awayî xelkê li dora xwe bicivîne û girs bibe ku ji kontrola dewletê derkeve û têkeve himberî dewletê jî. Dimîne îdeolojiya dînî. Di îdeolojiya dînî de piştî ku ji sedî notê Kurdan Musulmanên Sunnî ne nedibû ku hêzêk wiha bi navê Îslamiyeta Sunnî jî derkeve. Hêzek xwedan îdeolojiya Sunnî bi nijadê xwe Kurd xeterek ji îdeolojiyên jor jî mestir e ji bo dewletê. Em dizanin ku salên çûyî gava Partiya Îslamî ya Kurdistanê dest bi xebatê kir, zû bi zû dewletê êrîşeke hişk bir ser wê û ew eşand. Lê gava tevgerê bi navê Hizbullahiyê û bi huviyeta Şîitîyê peyde bibe, dewlet jî baş dizane ku ew tu caran di nav mîletê Kurd de (ê Sunnî, Alewî û Êzîdî) de bertireh nabe, bîngeheki gelêrî yê civakî jê re peyda nabe, tu carî wê nebe hêzek wiha mezin ku ji bin kontrola dewletê derkeve. Loma jî heta jê re lazim be, wê bi kar bîne, roja ku îşê wê xelas bû, bi hêsani wê serê wê bipelêxe. Bi vê baweriyê dewleta Tirk bêtîrs û xof destê xwe avêtîye Hizbullahiyê, wê bi cih dike,

çek û pere û îstixbarat û îmkanan didê, di hewine, ji bo rêk û pêk xistin û terora wan mirovên xwe dide wan. Helbet li rex diz, çeqel û pêxwasan, gelek kesên nezane, feqîr, birçî yan dindarên ji dinyayê bêagah jî tevî van dibin.

Hizbullah bi vî awayî hatiye danîn û îro li Kurdistanê li ber tevgera milî ya gelêrî a Kurd bûye xetereke mezin. Gava li bajarekî wek Nisêbînê ku berê 7-8 mehan nifûsa wê 70 hezar bû, ji ber terora Hizbullahê îro daketibe 20-25 hezaran, mezinahiya xetere diyar dibe. Her roj li gelek bajarên Kurdistanê sê çar insan bi destê van qatîlên dewletê tên kuştin. Xofa terore bere bere firehtir dibe, insanên bikêrhatî û zana diçin bin axê û xelkê welatparêzê e sivilî çawtirsandî dibe. Emin û îstîqrar û aramî di malan de namîne. Di salekê de taktîka Hizbullahiyê ya dewletê gelek bi ser ket û zirarek mezin gihand tevgera milî û civaka Kurdî bi xwe. Tevî vê jî em hîn di deşîfrekirina wê hêzê de ku girêdayî dewleta Tirk e, bi ser neketine. Eşkere ye em çiqas zûtir bi delîl û îspatan li ber çavê cihanê xin ku dewletê ev hêz ava kiriye, em bidin nişandan ku qatîlê insanên ku bi destê van tîn kuştin dewlet e, ewqas zûtir emê vê pilanê pûç bikin. Yan na çiroka îrtandîyan wê bê serê me jî.

Stîriyên me

Lawikê Berrivani

Ferhenga D. Îzolî Xemla Zimanê Kurdî ye

Bi min weha tê, fena ku ronakbîr û nivîskarên Kurd li hember xebat û berhemên hev pîrr çar in û heta mirov dikane bibêje ku gelek caran jî nankor û di hukmên xwe de jî bê însaf in. Em kirin û xebatên hev, zû bi zû teqdîr nakin, bîr û baweriyên xwe bi nivîskî li ser nabêjin û wan bi gel, bi xwendevanan nadin nasîn. Bi piranî, her kes pesnê yê xwe dide; yê ne ji min be û ji min re neke, mana xwe ew tune ye û tiştê dike jî ne baş e. Norm û pîvanên me yên di vî warî de, ji norm û pîvanên ronakbîr û nivîskarekî bêtir, dişibe yên serokeşîr û axayekî. Bi kurtayî, li ba me hîn tradîsyoneke hevçerx, medenî peyda nebûye.

Heger ne wisa buya, ma ne diviyabû heta nuha li ser ferhenga D. Îzolî, -ku çapa duyem jî çap bûye- bi kêmasî çend nivîsên kirîtîkî (rexnegirî) û nasandinê hatibana nivîsandin. Çimkî berhemeke wiha, hêja ye ku meriv li ser bi sedan nivîsan binivîsîne. Ev nayê wê manê ku qet kêmasiyeke ferhengê tune ye û ji her alî ve ferhengeke tekûz e, bê çewtî ye... Bê guman armanca min di vê nivîsarê de ne ew e ku ez li ser ferhengê lêkolîneke dûr û dirêj bikim. Lê di warê rastnivîsînê de, di warê tevlihevkirina tabîr (deyim) û gotinên pêşiyên û di wergera wan de (Ji Tirkî bo Kurdî. Bo nimûne tabîra "dağ fare doğurdu", bi awayê "çiya golik anî" bo Kurdî hatiye wergerandin) çewtiyên ferhengê hene. Dîsa di beşê Kurdî de, li gel hemberiyên Tirkî, hemberiyên maneyên Osmanî ya jî Erebi bihatana nivîsîn wê pîrr baş buya. Û ji xwe D. Îzolî jî di pêşgotina xwe de bala xwendevan dikşîne ser vê nuxte û dibêje, tişteki pîrr tabîî ye ku wek her ferhengê, di ferhenga min de jî hin kêmasî hebin.

Çapa pêşî ya ferhenga D. Îzolî, "Ferheng, Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî" di sala 1987'an de li Den Haagê, çapa duyem jî ji alî Çapxana Deng ve di Sibata 1992'an de li Stenbolê çap bûye. Bi qasî ku ez dizanim heta nuha li ser vê esera giranbiha tu kesî tişteki ciddî û îlmî nenivîsiye. Bi ya min, ev bêdengî ji bo ronakbîrên Kurd kêmasiyeke mezin e. Karekî wiha jî helbet dikeve ser milê kesên zimanzan. Divê ew, him ferhengê bi gel bidin nasîn û him jî li ser wê, rayên xwe bibêjin, başî, kêmasî û çewtiyên wê nişan bidin. Nişan bidin, ku bi vê riyê nivîskarê wê jî bikanibe ji wan dîtin, pêşniyar û rexneyan feydeyekê bibîne. Di çapên pêş de ferhenga xwe hîn firehtir bike. Kêmasî û çewtiyên wê rast bike.

Li Kurdîstana Turkiyê ev cara pêşî ye ku ferhengeke hewqas hêja derdikeve. Herçiqas berê çend ferhengên din derketibin jî, ne bi naverok û ne jî bi hecmê xwe yek ji wan jî nagihîje ferhenga D. Îzolî.

Ferhenga D. Îzolî 913 rûpel e. Li gor pêşgotina ku wî ji ferhengê re nivîsiye, li dora 30.000 gotinên Kurdî û 25.000 ji yên Tirkî di ferhengê de cî digrin. Ev hejmar, reqemeke mezin e. Ji bo amadekirina ferhengeke wiha mezin bi salan xebateke bi sebir divê. Ji xwe D. Îzolî bixwe jî di pêşgotina çapa yekem de dibêje ku cara pêşî Xwedê lê xweş be, Mele Evdîlkerîmê Silivî zimanê Kurdî li ber dilê wî şêrîn kiriye û ferheng encama xebateke 8 salan e. Ez wek Kurdekî, gelek sipasdarê xwediyê vê xebata nemir im.

Tiştêkî din ê baş ê ferhengê ew e ku, ew bi Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî ye. Di roja îro de ji bo me Kurdên Kurdîstana Turkiyê hebûna ferhengeke wiha îmkaneke gelek baş e. Ji bo hêsanîkirina karê xwendin û nivîsandinê, ji bo wergerê, ew serkaniyeke pîrr bi qîmet û bêhempa ye. Ji bo vê xizmeta hêja em çiqasî sipasî D. Îzolî bikin jî hindik e.

D. Îzolî lawê gundiyekî ji Dêrsimê ye. Bi qasî ku em ji pêşgotina wî fêr dibin. wî îmkân nedîtiye ku here Unîversîtê yan li ser ziman îxtîsasê bike. Ew, ji neçarî di 12 saliya xwe de erdê bav û kalên xwe terk dike û berê xwe dide xerîbîyê. Demêke dirêj li Turkiyê vê xerîbîyê dikşîne. Piştî 10 salan îcar hîn jî ji welatê xwe bi dûr dikeve, tê li Ewrûpayê, dibe mahçirekî Kurd û edî hew vedigere gundê xwe, Hulmanê. Nuha, ew li Holandayê wek karkirekî dixebite. Lê ne jiyana karkiriyê û ne jî şertên giran ew ji xebata wî ya îlmî û ji fedekariya wî ya ji bo mîlet, bi dûr nexistiye. Wî berhemeke weha pêşkêşî gelê xwe kiriye ku heta heta wê Kurd bi vê berhema wî serbilind bin...

Divê gelek zimanzanên me yên xwedî diplome li vê xebata D. Îzolî binêrin û ji xwe re kûr kûr bifikirin...

HEVPEYIVÎN

Dr. Seîd Şerefkendi:

Bi hemû riyên xebatê bawer bin û jê re amade bin

Armanç li ser hudûdê Kurdistanê Iraq û Îranê, li quntara çiyayê Qendil li Dola Şehîda bû mēvana Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê. Endamê redaksiyona me Mîrza Bextiyar, şevkê li meqerê Mekteb Siyasî, bi Sekreterê Giştî yê PDK-Î Dr. Seîd Şerefkendi re, li ser gelek meselên ku xwendevanên me meraq dikin, peyivî; Çima deng ji Kurdên Îranê dernayê? Di warê siyasî û iktisadî de rewşa Îranê û Kurdistanê Îranê çi ye? Kurd li ser hîlbijartinên ku çend meh berê li Îranê çêbûn, çi dibêjin? Têkiliyên PDK-Î li gel hêzên siyasî yên Kurdistanê Îranê, bi hêzên Îranî û eqliyetên din re çawa ne? Piştî bûyerên nexweş nuha navbera PDK-Î û Komela çawa ye? Bedelê 10-12 salên têkoşîna çekdarî çi bû? Piştî hewqas bûyer û guherînan, têkiliyên PDK-Î û dewleta Iraqê di çi rewşê de ne? Gelo çima Kurdên Kurdistanê Îranê, xwe ji Kurdên perçeyên din dîr digrin?

Dr. Seîd Şerefkendi tu pirseka me bê bersiv nehişt.

Armanç: Li gor Kurdistanê Iraq û Tirkîyê, çapemeniya dinê kêm qala Kurdistanê Îranê dike, sedemê wê yekê çîye?

Dr. S. Şerefkendi: Dewletên mezî yê dinyayê rewşa Îranê bi şeklekî taybetî digrin ber çav. Amerîka, Ewropa Rojava, rewşa Îranê taybetî digrin ji bo ku Îran di mesela Iraqê de bêteref bimîne. Ji bona ku Îran piştî tîkçûyina Sovyetê, li cumhûriyetên Îslamî tehrîqên mezî neke. Di pîrsa Afganîstanê de kêmîr terfîban saz bike. Ji ber wê yekê Îranê rewşek bi dest xistiye ku, Rojava û bi taybetî jî masmediya Rojava, Îranê nakin mijareke taze û aktuel.

Ya na gelê Kurd, li seranserê Kurdistanê li dijî rejîmê ye. Û xebata hêzên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê çi di warê siyasî de û çî jî di warê pêşmergeyê de be, li seranserê Kurdistanê, bi fi-rehî heye.

Ferq di navbera siyaseta Îran û dewletên din de (mesela Tirkîyê), heye. Îran heta ku îmkân hebe he-wil dide ku perdeyê bédengiyê bi ser tîkoşîna gelê Kurd re bîkî-sî-ne; deng û bahsên faalîyetên tîkoşîna pêşmerge û partiyê, bi giştî yê hemû muxalefetê belav na-kîn.

Armanç: Di warê siyasî û iktisadî de nuha rewşa Îranê û Kurdistanê çawa ye?

Dr. S. Şerefkendi: Rewşa iktisadî ya Kurdistanê ji rewşa iktisadî ya Îranê ne cuda ye. Îran ji alî iktisadî ve îro di rewşeke ge- lek xerab da ye. Ev rewş, tesîrê li hemû xelkê Îranê û Kurdistanê dike. Bêkarî yekcar pir e. Kar ge- lek kêm e. Hatîni gelek kêm e, lê li hemberî wê, qîmeta tiştan gelek giran e. Bi giştî, tu malbat bi xebata kesekî tenê nikare debara xwe bike. Rewşa kesên ku di kar û barên dewletê de dixebitin yek- car zehmet e.

Armanç: Li Îranê beriya çend mehan hîlbijartin çêbûn. Hûn ne- tîcên van hîlbijartinan çawa hildi- sengînin?

Dr. S. Şerefkendi: Beşda- rîya hîlbijartinê gelek kêm bû. Bi taybetî li Kurdistanê xelkê beşda- rîya hîlbijartinan nekiriye. Evê beşdarî jî kirine xwestine muxale- feta xwe li hember rejîmê nîşan bidin.

Ez nimûneyekê bidim ka xel- kê çiqas beşdarî kiriye. Navçeya Mahabadê xwedî 150.000 hîlbijê- ran e. Tenê 49.000 kesî deng da- ye. Ew nûnerên ku çûne meclîsê jî bi 16.500 dengî çûne. Hema çî bigre hemû bajarên Kurdistanê bi vî rengî bûne. Li tevayîya Kurdis- tanê zêdetirî jî sedî 70'yê hîlbijê- ran deng nedane. Ev jî dide nîşan- dan ku xelk çiqasî xwe ji rejîmê cuda dibîne.

Armanç: Beriya çend heyvan we kongra xwe kir. Wek partî di stratejiya we de tu guhertin heye? Stratejiya we hîn "otonomî bo Kurdistan û demokrasî bo Îran" e?

Dr. S. Şerefkendi: Belê. Di kongra me ya herî dawîn de ku me çend meh berê kir, her me ev stratejî û şîar parast.

Mumkun nîne rejîma Îslamî otonomiyê bide Kurdan

Armanç: Heger îro rejîma Rafsancanî bibêje werin em otonomiyê didin we, lê li alî din li Îranê demokrasîyêke rasteqûn pêk neyne an hûn ne bawer in ku wê pêk bîne, ma wê otonomîya Kur- dan ne 'emirkin be?

Dr. S. Şerefkendi: Bêyî hebûna demokrasîyê li Îranê, otonomî jî bo Kurdistanê ne mum- kun e. Mumkun nîne rejîma Îsla- mî ya ku îro li ser hukum e, otonomiyê bide Kurdan. Dema ku Kurd otonomiyê bistînin, ev tê wê manê ku hukûmet guheriyê, hukumeta Îslamî ne li ser hukum e.

Armanç: Li Iraqê jî eynî tişt bû. Demokrasî nehat Iraqê, lê mecbûr man otonomiyê bidin Kurdan. Piştî qeweta xwe dan hev êrîş kirin, otonomî jî destê wan derket?

Dr. S. Şerefkendi: Dibe ku di warê siyasî de, di wê otono- miya Kurdên Iraqê de hin kêmasî hebin. Lê di warê kulturî de Kur- distana Îranê û Tirkîyê heqê wan pirtir e.

Li Kurdistanê Iraqê, nuha di bin otonomîya heyî de gelek kov- var, tiyatro, nivîs, pirtûk hene; huner û zîmanê Kurdî li gor Kur- distana Îranê û Tirkîyê gelek pêş- ketiye. Otonomîya Kurdistanê Iraqê huqûqê siyasî jî xelkê re temîn nekir, lê belê huqûqê kulturî da xelkê Kurdistanê Iraqê.

Armanç: Nuha taktîka Par- tiya we li gor vî stratejiyê çawa ye?

Dr. S. Şerefkendi: Partiya me 46-47 salî ye. Di van 46-47 salan de li gor rewş û qonaxan Partiyê taktîkên munasîb hîlbijar- tine. Heger ez bi taybetî qala 10- 12 salên dawî, piştî hatina rejîma Îslamî ser hukum bikim, şeweya eslî, taktîka eslî xebata çekdarî



ye. Hukûmetê ev şiklê xebatê bi me da kirin. Çunkî hukûmetê jî bo me tu riyeke din nehiştibû.

Partiya Demokrat a Kurdistana- nê, her tim amade ye ku xebata siyasî û demokratîk a legal bike. Roja ku ev rê jî me re vebû, emê taktîka xwe biguherînin. Lê belê hîç riyeke demokratîk tunebe, ev 12 salên dawîn jî da nîşandan ku emê karibin xebata çekdarî bi- domînin. Îro çî şiklê xebatê, pê- wîst be, çî şiklê xebata tîkoşîna me pêş bixîne, PDK-Î amade ye, wê şiklê xebatê pêk bîne.

Armanç: Bedelê 10-12 salên çekdarî çi bû?

Dr. S. Şerefkendi: Netîce- ya 10-12 salên şerê çekdarî ev in: Beriya her tiştî mîletê Kurd nîşan da ku ew teslîm nabe, li meydana

xebatê jî bo heq û huqûqên xwe yê meşrû xwe parastiye. Xelkê Kurd bi giştî, li dijî rejîmê seki- nî. Li Kurdistanê rejîma Cumhû- riyeta Îslamî nikariye hîç pêgîrek berbiçav, ne siyasî, ne civakî pey- da bike. Kurdistan bi kuliyeta xwe rejîmê red dike. Xelkê Kur- distana Îranê jî ji her demê bêtir bi heq û huqûqê milî, siyasî û kulturî yê xwe dizane.

Armanç: Têkiliyên we bi hê- zên siyasî yên Kurdistanê Îranê, bi hêzên eqliyetên Îranê û bi hê- zên Îranî re çawa ne?

Dr. S. Şerefkendi: Ji bo ku şîara Partiya Demokrat, "de- mokrasî jî bo Îranê" ye û "oto- nomî" jî ferhek jî ve demokrasîyê ye, ji roja pêşî prensîbeke esasî ya Partiyê ew e ku cepheyek fireh bi hemû hêzên Îranî yê demok- rasîxwaz û pêşverû re ava bike. Lê mixabin ji ber sedemên cur bi cur ev cephe heta îro pêk neha- tiye. Lê Partiya me hîn jî xwe-

Armanç: Salên çûyî di nav- bera PDK-Î û Komela de hin bû- yerên nexweş çêbûn. Nuha rewş çawa ye?

Dr. S. Şerefkendi: Nuha, ew şer û tiştên ne xweş li gel Ko- mela nemane, tîkiliyên me bi wan re hene. Komela rêxistineke Kurdistanî bû. Dûre ji rêxistinîya Kurdistanî derket, bû rêxistineke seranserî Îran, di nav Partiya Ko- munîst a Îranê de. Dema ew ketin nav Partiya Komunîst, navbera me ne xweş bû. Çunkî ferqa fikir û tefkîra di navbera rêxistineke Kurdistanî û Îranî de gelek e. Lê nuha Partiya Komunîst ketiye krîzekê û Komela jî jê cûda bûye. Nuha Komela bi hîsên xwe dîsa bûye hêzeke Kurdistanî.

Em û Komela gelek nêzikî hev nebûne, lê halletê şer di nav- bera me da nemaye û hêdî hêdî tî- kilî û diyalogên dostanî di navbe- ra me de dest pê kirine. Em hatine rewşek wisa ku êdî em dikarin bi hev re di meydana xebatê de hin kar û hevkarîyan bikin.

Têkiliya PDK-Î ya bi Iraqê ra bi prensîb e

Armanç: Dramek me Kurdan heye; ew jî ji coxrafya me tê. Her çar aliyê me dewletên dijmin in. Dema em şerê çekdarî didin, ji neçarî diçin, destê xwe dirêjî yekî ji wan dikin. Û heta nuha ev dram, gelek caran bûye trajedî jî. Gelo nuha tîkiliyên we bi Iraqê re çawan e?

Dr. S. Şerefkendi: Heger maneya "tîkilî" be, tu tîkiliyên me bi dewleta Iraqê re tunene. Mesele bi şeweyêke din e. Tevge- ra Kurd li her perçeyên Kurdistanê heq heye ku ji dijayetiyan di nav- bera dewletên ku Kurdistan par- vekirine, feyde bigre. Dijayeti di navbera ew dewletên ku Kurdistan parvekirine hene. Tiştêk gelek tabîî ye ku di warê siyasî de tev- gera Kurd ji van dijayetiya feyde bigre ji bo pêşde birina xebata xwe. Lê prensîbê esasî yê PDK-Î ku roja pêşî de ye pê radibe ew e: divê ev pêwendî bi hîç cureyekî zîrarê nede Kurdên wî welatî, divê li ser hin menfe'etên muşterek be.

Pêwendiyên me yê bi prensîb ku di van çend salan de bi hukû- meta Iraqê re hene, gelek baş dan nîşandan ku ev siyasat dikare bê tatbîqkirin. Şahîdê wê yekê mew- qîfê PDK-Î tê da ye, tesdîqa hemû partiyên siyasî yên Kurdistanê Iraqê û tesdîqa xelkê Kurdistanê Iraqê ye. Tu kes nikare siyasat û hel- westê PDK-Î û pêwendiyên wê li gel hukumeta Iraqê, bibînin an hebe ku li dijî menfe'etên Kurdên Iraqê bin. Ev pêwendî karê bibe model li hemû perçeyên Kurdistana- nê jî bo hemû tevgerên Kurdî.

Şoreşa Kurdistanê Iraqê û Jinên Kurd

Ev sê sal bûn ku me grûbek tercuman û mamosteyên Kurd bi hin hiqûqnasên Swêdî re li Xwendegêha Bilind a Gel li Biskops Arnö, termên hiqûqî yên Swêdî tercûmeyî Kurdî dikirin. Ev xebat, di Gulana 1992'an de temam bû û me xwest ku berî çapkirinê em vê xebata xwe li Kurdistanê kontrol bikin. Me bi vê armançê di mabeyna 24'ê Hezîranê û 12'yê Tirmehê de Kurdistanê Iraqê ziyaret kir. Ji Zaxoyê heta Helebçeyê, me gelek dezgeh, cîh, kadro, serok û rêberên Kurdistanê yên siyasî û rewşenbîr ziyaret kirin. Em dîr û dirêj bi wan re peyivîn.

Di ziyareta me de min dît ku em Kurdên ji perçeyên Kurdistanê yên din li ser fedekariyên jinên Kurdistanê Iraqê û tevgera wan pir hindik tiştan dizanin. Loma min giraniyek mezin da ser naskirina yekitiyên jinan, rêberên wan û parlamenterên Kurd ên jin.

Ez bi Sekretera Giştî ya Yekitiya Afretên Kurdistanê Şêrîn İbrahim, endamê sekretaryaya karbirêvebir Evîn Omer, Helîme û Zahîde Şexo re peyivim. Di Parlamentoya Kurdistanê de bi wezîra jin Kafîye Silêman û jinên parlamenter Nehle Mihemed, Fewziye İzedîn, Gelawêj Ebdulcebar, Perîxan Mehmûd, Hêro İbrahim û Şefîqe Feqî Ebdula û Silêmaniyê bi gelek endamên Yekitiya Jinên Kurdistanê re peyivim.

Li Kurdistanê Iraqê çend komîte û yekitiyên jinan hene. Hemû ji bi awakî bi ser hêzekê ve ne. Ji van yekitiyan yê herî mezin Yekitiya Afretên Kurdistanê ye, ku nêzî PDK ye û di sala 1952'an de hatiye avakirin û Yekitiya Jinên Kurdistanê ye, ku nêzî YNK ye û li Îranê di 4. 11. 1989'an de hatiye avakirin.

Dîroka tevgera jinên Kurdistanê, di dîroka Şoreşa Kurdistanê Iraqê de xwedî rûpelên gelek bi rûmet e. Gelek jinên Kurd mêrên xwe, zarokên xwe, bira û xwişkên xwe, heval û cîranên xwe wînda kirine. Lê îro bi moraleke bilind dibêjin "pîrsên me pîrsên Kurdistanê ne" û ji bo parastina qezencên şoreşê û avakirina Kurdistanê ji gundan heta parlamentoyê, di her sewiyê de, bi fedekarî dixebitin. Piştî ku min ev yek dît hevîya min ya ji bo pêşeroja şoreşa Kurdistanê xurtir bû.

HAYDAR DILJEN

Kafîye Silêman:

Pêwistiya me bi şiyarkirineke giştî heye

Armanç: Ji bo me hemûyan serbilindiyeke mezin e ku jineke Kurd bûye Wezîra Beledîyan û Turîzmê. Di vê roja îlankirina wezîran de tu çi his dikî?

Kafîye Silêman: Ez îro pir serbilind im ku Kurdan hukumeta xwe demezirandîye û di vê hukumetê de jinek ji beşdar e, ev yek ji bo min kêfxweşiyek mezin e.

Armanç: Baş e, çima wezareta Karûbarên Beledîyan û Turîzmê dan te û ne wezareteke dî?

Kafîye Silêman: Bi reya min ev wezaret wezareteke e ku peywendiyên wê li gel xelkê pir in. Karê ku dike raste rast ji bo xelkê ye û bi vî rengî wezareteke e ku her tim di nav xelkê de ye. Bes ne wek jinek wek insanek her tim daxwaza min ew bû ku welatê min ciwan be, hemû mintiqeyên welatê me ji bo turîzmê amade bin. Her cihê ku min didît, min digot xwezî weha bûya, xwezî avî bûya, havigeh weha bûya, Ev tişt li ba min hebûn. Xuya ye ku hevalan ji dizanibû ku ez dikarim vî karî bikim, loma jî ev kar spartin min.

Armanç: Tu dikarî piçekî behsa jiyana xwe ya siyasî bikî?

Kafîye Silêman: Min Fakultaya Fenê beşê fizîkê qedandîye. Hîn di dema mekêba navîn -orta okul- de min li gel Yekitiya Qutabiyên Kurdistanê peywendî danî. Paşê di sala 1973'an de li gel Komeley Rejderanî Kurdistanê peywendiyên min çêbûn. Ku hingê min Fakultaya Fen beşa fizîkê bi dawî anibû. Ez bûm mamosta û hatim Silêmaniyê. Van peywendiyên heta sala 1985'an bi şeweyekî nehênî dom kirin. Di sala 1985'an de min bi hêzên peşmergeyên Kurdistanê re peywendî danin û ez li çiyân bûm heta dema serhildanê. Dema serhildanê em hatin nav bajarên û me xebata xwe ya siyasî domand.

Armanç: Di parlamentoya Kurd de ji 105 kesan bes 6 jin in. Di nav serokatîya partî û hêzên siyasî de ev rewş hîn xirabtir e. Gava ku rewş weha be gelo mirov dikare li Kurdistanê



Wezîra Beledîyan û Turîzmê
Kafîye Silêman

di mesela mafên jinan de behsa demokrasîyê bike? Ji bo guhertina vê rewşê hûn dixwazin çi bikin?

Kafîye Silêman: Ji bo ku jin bi zîrekiya xwe, şexsiyeta xwe û karîna xwe bawer be; pêwistiya me bi şiyarkirineke giştî heye. Heta niha civak civaka mêran bûye. Û vê civakê rê nedaye ku jin xwe binasin. Eger ku jin xwe binasin, û karîna xwe bi kar bînin, wê wextê wê nîsbeta jinan di beşdarbûyina karûbarê civakî de ji ya mêran kêmtir nebe.

Bi raya min, mêrên ku di nav hizbên siyasî de kar dikin bes di nav nivê civakê de kar dikin. Bi vê yekê ne tenê jin ew bi xwe jî zerarê dibînin. Ku mirov karekî bike divê mirov di nav hemû civakê de bike.

Armanç: Wek jin di nav kabîne de çî girtina te hedîseke dîrokî ye û serbilindiya jinên Kurd û hemû Kurdan e. Ez dixwazim bi zanibim gelo heta niha tu rojnamevanekî li gel te hevpeyvîn kiriye?

Kafîye Silêman: Zor sipas. Na, ev yekem car e ku piştî wezîrbûyina min wek rojnamevan tu bi min re hevpeyvînê dikî. Ez vê sibê ji Silêmaniyê hatim. Berê eşkerakirina wezîran, em civiyan. Em niha ji civînê derketin û ez bi te re dipeyvîm. Çend deqeyên din wê civîna parlamentoyê dest pê bike.

Jinên Parlamentar:

Pîrsên me pîrs

Armanç: Li gor te, li Kurdistanê rizgarkirî problemên jinên Kurd yê herî girîng çî ne?

K Silêman: Li Iraqê zordestiya netewî li ser peya û jinên Kurd hebûye û vê zordestiya bi tu hawayî rê nedaye civak normal bi pêşkeve. Lê problemêke din ya jinê jî hebûye ku nikarîbûye bi awayê pêwîst beşdarî tev mecalan bibe. Jin, di warê ixtîsasî û tenfîzî de beşdar bûne, lê bi tu awayî beşdarî wergirtina qerarên siyasî nebûne, yan jî pir kêmtir bûne. Lê em hewl didin ku jin bikaribin di warê qerarên de jî; çî li nav grûbên siyasî çî di nav dezgegan din de bikaribe giraniya xwe daye.

Nehle Mihemed: Problemên girîng ên jin û mêran yek in. BAAS çî bi serê mêran de aniye eynî tişt bi serê jinan de jî aniye. Jin û mêr kevîrê hîmê malbatê ne. BAAS'ê ji bo armanca xwe, ji bo têkdana malbatê jin bi kar aniye. Ez dixwazim ji bo te nîmûnekê bibêjim. Min malek nas dikir ku jinik endama Partiya BAAS bû. Emir dabûn ku jin mêrê xwe kontrol bike. Jinê li ser mêrê xwe rapor dinivisand. Yanê jin li ser mêrê xwe wek casûs hatibû tayîn kirin. Wek min li jor behs kir, malbat têk çûbû. BAAS'ê tu bawerî di navbera jin û mêr de nehiştibû. Malbat, bi babet babet awayan hatiye perçekirin. Yekem wezîfa me jî nû ve avakirina peywendiyên malbatî yên normal e. Jin ya bixwe hatiye girtin, yan mêrê wê hatiye girtin. Dema ku mêrê wê hatiye girtin, bi zarokên xwe ve derbeder bûye, li çiyân jiyaye. Yanî jina Kurd jî wek pevan beşdarî li şoreşê kiriye û bi hezaran babet zilm û zordestî lê bûye. Di şoreşa Kurdistanê de rola jinan hindiktir bi qasî ya mêran e.

Fewziye İzedîn: Muşkileyên jinên Kurd hene. Lê nuha qonaxek din e ji bo jina

Kurd ku gihîştîye ta parlamentoyê. Ez hêvîdar im, em nûnerên jinên Kurd bikaribin doza jinên Kurd hel bikin. Niha wezîreke me ya Kurd jî heye. Ev gaveke pîroz e ji bo jinan.

Perîxan Mehmûd: Problema me ya esasî ev e: qanûn qanûna mêran e. Ku di civaka me de wek cariyekê li jinê nêrîn bê berdewamkirin, cihê jinê wê bi qasî cihê cariyekê be. Cihê cariyekê jî em dizanin ku di civakê de çî ye. Ku cihê jinê di civakê de nebe, ez qet bawer nakim ku pêşeroja me pêşketî be.

Dayik li malê pir girîng e ku bikaribe zarokên xwe perwerde bike. Feqet ku cihê dayikê di mala wê de nebe, wê di civakê de çî rola wê hebe. Divê em bixebitin ku di civakê de cihê jinê hebe ku mustewayê rewşenbîrî, nefsi, civakî, aborî bilind bibe. Ez bixwe mesela aborî meseleke sereke dibînim. Jin ne ku wek sarincekê (bûzdolabî) li malê be.

Armanç: Lê tevî vê jî em dinêrin ku piştî şoreşê, di birêvebirina kar û barên civakî de rola wan ne hinde mezin e. Di vî warî de hûn dixwazin çi bikin?

Nehle Mihemed: Berî her tiştî em dixwazim malbatê ava bikin. Malbat têk çûye. Paşê em dixwazim di warê aborî de azadiya jinê hebe ku bikaribe karê xwe bi xwe bi rêve bibe. Piraniya jinên me bê mêr in, mêrên wan yan di şer de şehîd bûne, yan hatine îdam kirin, yan jî hîn di zîndanên BAAS de ne. Paşê em ê hewl bidin ku jin jî wek mêran beşdarî karûbarên siyasî, sosyal û demokratîk bibe, di dezgehên kulturî û yê din de bixebite. Karê hundur malê û li zarokan nihêrin bes ne karê jinan e. Divê jinên me bikaribin her mafê mirovî bi kar bînin. Ez bixwe muhendîsa elektrîkê me. Ez endama du komîsyonên parlamentoyê me, ji wan yek Komîsyona Avakirina Kurdistanê ye,



Jinên parlamenter Fewziye İzedîn û Şefîqe Feqî Ebdula (Foto: Armanç)

Kurdistanê ne

Yek ji Komisyona Xizmetguzarê ye. Kurdistan wêran bûye. Xelk li benda xizmetê ye. Ji bo me îro roj roja xizmeta gelê xwe kirin e. Nabe ku mirov ferqê têxe nav jin û mêran û bêje ev karê jinan e û ev jî yê mêran e. Pêwîst e herdu alî jî beşdarî vê xizmetê bibin.

Armanç: Baş e îro parlamentoya Kurdistanê wezaret û wezîrên xwe îlan dîke, tu wek parlamentereka Kurd çi hîs dikî?

Nehle Mihemed: Ev hîsên min yê her Kurdekî ne. Îro ji bo min wek cejnê ye ku bi 15 wezîran hukumeta Kurdistanê tê damezirandin û niha jî em li korîdora parlamentoyê rawestiyane û çavên me li hatina berêz wezîrên me ne ku werin li hember parlamentera û mîletê Kurd sond bixwin ku bi dilsozî xizmeta gelê me bikin. Ev yek, ne bes ji bo Kurdên Iraqê, ji bo Kurdên hemû perçeyên Kurdistanê serketineke mezin e. Jineke Kurd jî, bi navê Kafiye Silêman, di nav Wezîran de ye. Ev ji bo me jinên Kurd serbilindiyek e.

Gelawêj Abdulcebar: Ji vê xweştir tiştek nîne. Ji bo me hemûyan pîroz be. Ez hêvîdar im ku bikare ji bo gel xizmetê bike.

Fewziye Îzeddîn: Ez wisan kêfxweş im ku nizanîm çi bêjim. Ez vê rojê ji bo mîletê Kurd pîroz dikim.

Perixan Mehmûd: Me ev roja bê tîrs û bê postalên BAAS pir pa.

Şefîqe Ebdula: Ev cejna Kurdistanê ye. Cejnê wisan e ku çend sal in ji bo wê xwîn tê rîjandin. Înşallah xwîna şehîdên me li tinê neçe û mîletê me bikaribe ji van tengasîyan xilas be. Çimkî dijmin muşkilîyên welê derxistîye pêş me ku ji ortê rakirina wan jî pir zehmet e, lê înşallah emê bikaribin çareyekê bibînin ku ji van muşkilîyan xelas bin.

Armanç: Dilê me dixwest ku nivê endamên parlamentoyê jin bûna. Gelo şêş parlamentera ne hindik in?

Perixan Mehmûd: Bi rastî jî beşdarbûna jinan pir girîng e. Hemû mêrên civakê şerqî dibêjin jin û mêr wekhev in. Lê di piratîkê de ne wisa ye. Problema jinan problemeke zehmet e. Rîskên ku li ser rîya çareserkirina vê problemê de hene jî divê mirov ji bîr neke.

Fewziye Îzeddîn: Di parlamentoyê de em şêş jin in. Bi rastî jî şêş kes nisbetekî kêr e, lê destpêkeke baş e.

Armanç: Wezaretê Edaletê dane yekî ji Partiya Îslamî. Wek ku hûn jî dizanin edaleta Îslamê her tim li dijî jinan alîgirê mêran e. Baş e vê yekê hûn çawa dibînin?

Perixan Mehmûd: Ev mesela tu behs dikî, meseleke girîng e. Lê nabe ku em li cîhê xwe raw-

estî, divê em gavanan bavêjin; gavane bi program û aqilane. Ev muhîm e. Mesela dîn meseleyeke hesas e. Em jî musulman in. Lê tu alaqa me bi bir û baweriyên ku dixwazin jin li malê rûne û mêr çar jinan bîne ser wan, nîne. Bi raya min ev ne însaniyet e.

Armanç: Li Kurdistanê Iraqê du yekitiyên jinan hene. Ji wan yek Yekitiya Afretên Kurdistanê ye, yek jî Yekitiya Jinên Kurdistanê ye. Hûn çar parlamenterên jin ji Yekitiya Jinên Kurdistanê ne û dido jî ji Yekitiya Afretên Kurdistanê ne. Peywendiyên we li gel hev çawan in?

Perixan Mehmûd: Bi rastî pîrsa jinan pîrseke girîng e. Nabe ku em perçe perçe bin. Mesela, me li Silêmaniyê dest bi karekî kirîye ku jinên Yekitiya Jinan, jinên Yekitiya Afretan, Rabîta û jinên Partiya Sosyalîst yek bigirin. Ku em yek bin, em dê bi hêztir bibin û di civakê de bibin hereketeke xwedî giranî.

Nehle Mihemed: Ez jî wek xwişka Perixan difikirim. Divê li Kurdistanê tevgera jinan yek be.


Armanç: Baş e çima du yekitiyên jinan?

Nehle Mihemed: Em bi xwe li dijî perçebûna jinan in. Pîrsên jinan muştêrek in. Eger li aliyê Yekitiya Jinan be, eger li aliyê Yekitiya Afretan be hîç ferq nake, doza jinan yek e. Loma jî divê em yek hereket bin, yek rêxistin bin, ku bikarin doza jinan, ku pir aloz e, hel bikin.

Perixan Mehmûd: Li gor min divê jin bê teref bin. Ji ber ku ew bi xwe xwedî dozeke pir girîng in. Nabe ku perçe perçe bin.

Armanç: Baş e ji bo wekheviya jin û mêran tu programeke we heye?

Perixan Mehmûd: Belê heye. Wek YNK bernameya me heye û di kongreya Yekitiya Niştîmanî ya yekem de jî hatiye tesdîqkirin. Ez bi xwe li kongrê bûm û min ji bo qebûlkirina vê programê îş kir. Xala vê bernameyê ya yekem li hember qanûnê wekheviya jin û mêran e. Û divê qanûnek bê hazîrkirin ku hin astengên li ber jinan rabin û jin ji çerçewa mala xwe derkeve û têkeve nav civakê û kar bike. Mada ya siyem fêrkirin e. Li Kurdistanê, di warê xwendinê de, di navbera jinên bajarî û jinên din de ferqeke mezin heye. Jinên gundan bi her awayî paşde mane. Gelek problem di navbera jin û mêran de hene ku ne hewce ye hev û din bidin mehkemê. Em bikaribin degecheke çak ava bikin ku bikaribe gelşên wan hel bike. Meseleyên jinên derbeder em li dereca yekem digirin. Piştî wê em bi meseleyên jinên bajarî re mijûl dibin. Ji ber ku rewşa jinên bajarî ji ya



Jinên Parlamenter Ji milê çepê Perixan Mahmûd, Gelawêj Ebdulla û Nehle Mihemed bi nûçegîhanê me H. Diljen re (Foto: Armanç)

derbederan baştir e, dikarin îş û karên xwe bikin.

Armanç: Hûn ji du listeyên cuda hatine hilbijartin. Ev yek bi çi hawî tesîrê li ser peywendiyên we dîke û hûn bi çi rengî dikarin li parlamentoyê bi hev re hevkarîyê bikin?

Kafiye Silêman: Bîr û bawerîya jinan a siyasî çî dibe bila bibe, her jin in û muşkula wan yek e, daxwaza wan yek e. Divê mesela partîtiyê mirov dernexe pêş. Tiştekî din jî, jin bi derdên jinan zanin neku mêr. Bi nisbet hemû rêxistinên siyasî berî hilbijartinê gotine ku piştî avakirina parlamentoyê divê qanûna wekheviya jin û mêran derkeve. Lê pêwîst e ku pêşniyara jinan bi xwe jî hebe. Divê jin bixwe diyar bike ku daxwaza wê çi ye. Wekheviya jin û mêran wê çawa çêbibe? Di vê babetê de divê li parlamentoyê jî jin bi hev re hevkarîyê bikin, bi hev bişewirin, Bîr û baweriyên xwe bi hev biguherin, li nav jinên din bigerin, bi temamî gelşa jinan tê bigihên, daxwazên wan bi pêşniyaran li nav parlamentoyê munaqeshe bikin. Piştî wê di qanûnê welêt de wekheviya jin û mêran bi cîh bikin.

Fewziye Îzeddîn: Em li parlamentoyê, nûnerên jinên Kurdistanê ne, ne bes nûnerên jinên palpiştên YNK an PDK ne. Em wek jin manake me heye. Problema me yek e. Em ji yek neteweyî ne, em Kurd in, ne cûda ne. Helbet wek li hemû dinyayê bîr û baweriyên siyasî yê cuda dê di nav me de jî hebin. Di vî warî de her kes azad e. Heta dema ku em li parlamentoyê rûdinin û li ser meseleyên welatê xwe dipeyivin, em nafikirin ku ew ji vî partiye ye û yê din jî ji partiya din e. Em Kurd in, problem û armançên me yek in.

Komîteyên me hene; Bi rîya van komîteyan em li ser problemên jinan munaqeshe dikin, encam û pêşniyarên xwe ji bo helkirinê, pêşkêşî parlamentoyê dikin.

Nehle Mihemed: Raya Fewziye Xanimê pir durist e. Ji ber ku em nûnerên mîlet in. Em li hember mîlet berpirsiyar in. Doza mîletê xwe, ku pir aloz e, divê em zû hel bikin. Ji bo vî divê em fikrên partîtiyê di parlamentoyê de ji celsiyên xwe bi dîr xînin. Divê em wek nûnerên mîletê Kurd bi-

fikirin û hereket bikin ku em çawa dikarin doza mîletê Kurd çareser bikin. Niha mesela aborî mesela herî girîng e. Hukumeta BAAS ablûqa aborî daniye ser Kurdistanê. Divê em mesela aborî bi awakî acil hel bikin. Li nav parlamentoyê em şêş jin bi hev re wek xwişk û bi parlamenterên mêr re jî wek bira hereket dikin. Ji ber ku dijmin derdora me girtîye û problem û hedefa me yek e.

Gelawêj Abdulcebar: Meseleyên ku em li ser li hev nekin, nînin. Muşkula me yek e. Divê em heryek ne ji bo partiya xwe, ji bo hemû neteweyê xwe kar bikin. Berpirsiyariya me mezin e.

Armanç: Gelo ma tu dixwazî bi wesita Armançê ji jinên Kurd yê li seranserê Kurdistanê û yê li derveyê welêt re tiştekî bêjî?

Kafiye Silêman: Ez ji hemû jinên Kurd re dibêjim, divê ku bizanibin ew xwedan taqet in û ji bo xizmeta neteweyê xwe, dikarin di hemû kar û baran de beşdar bin. Divê bi xwe bawer bin ku bi taqet in û dikarin hemû karê bikin.

Perixan Mehmûd: Ez bi xwe ji hemû jinan dawe dikim ku piştigiriya me bikin. Ev yek. A dîna divê jin bi xwe ji bo xwe kar bikin, muhtacî mêran nebin, **Nehle Mihemed:** Wek ku min berê jî behs kir, Divê jin di warê aboriyê de azad be ku bikaribe xwe îspat bike ku heye. Divê jin dawa wekheviyê bike.

Gelawêj Abdulcebar: Bavê zarokên min bi YNK'ê re kar dikir. Mudetê dîr û dirêj li zîndana Ebû Xerêb (ku em ji re dibêjin qesabxane) girtî bû. Di sala 1987'an de hat îdam kirin. Û niha

jî du zarokên min hene. Lê dîsa jî bîrûbawerîya min bi min bi xwe û bi şoreşê neşikiya û ez îro parlamenter im û li ser xwe me. Ez dixwazim hemû jin weha bi xwe bawer bin û li ser xwe bin.

Nehle Mihemed: Ev roja ku Hukmeta Kurd îlan dibe, bi saya xwîna şehîdên me ye. Ji wan şehîdan yek jî mîrê xwişka Gelawêj e. Xwişka Gelawêj di rîya rizgarkirina welêt de mîrê xwe wînda kir, niha du sêwiyên wê li malê ne û ji bîr û bawerîya xwe tu tiştek wînda nekirîye û îro bi moraleke bilind di parlamentoya Kurdistanê de parlamenter e. Bi rastî di tevgera rizgarîxwaz a Kurdistanê de fedekariyên ku jinên me kirine ji yê mêran ne kêmtir in. Jinên me nefî bûne, hatine kuştin, derketine ser çîyan, hatine zîndan kirin, mêr û zarokên xwe wînda kirine, sêwî di hustu de mane, tû û birçî mane, lê dîsa jî her tim di şoreşê de bûne xwediyên rolên girîng.

Ez bi xwe Hewlêrî me. Dema ku hêzên BAAS bi tank û topan hêriş anîn ser Hewlêrê ez li Hewlêrê bûm. Wê rojê hindiktir 3000 însan li ser cadeyan kuştin. Wê demê em bi awakî cemawerî ji Hewlêrê derketin. Bi rê ve balafirên Hukumeta Saddam bombe berdan ser me. Li pêş çavên min 21 kes şehîd bûn. Me bar kir, em çûn Îranê, Ordîgahê Qirwa. Fewziye Xanim ku ew jî endama parlamentoyê ye, li gel min bû. Pir derd bi serê me de hatin. Ez bi xwe dayika çar zarokan im. 16 şevan em di nav erebê de raketin! Wê demê hemû cîhanê temaşa vî tirajediya me dikir. Ez dawa dikim ku hemû cîhan piştigiriya me bike, guh bide me, ka derdê me çî ye.

Jinên Parlamenter

Nehle Mihemed: Mihendîsa elektirikê YNK

Gelawêj Abdulcebar: Mamosta YNK

Perixan Mehmûd (Şemaw): Ekonomîst YNK

Fewziye Îzeddîn: Nivîskar, Mamosta PDK

Şefîqe Feqî Ebdula: Mamosta PDK

Hêro Îbrahîm Ehmed: YNK

SERPÊHATIYA KULÎLKÊN BEJÎ

(bo Rono)

□ *Ehmed Huseynî*

-I-

Ez û tu. Serpêhatî û du çûkên şilbûyî bi xunava şiniyên giranbuh. Hêlîna çavê te hêjayî axîna min bû û bi xwelibakirina porê te re rûpelên serpêhatiyê diweşyan. Sira bayê sibê û tovên bêrikirî bi hev şadibûn. Tu di nav pencên xewna min de zuha dibûyî, pirsên min ji singa te weke çavkaniyan dipijîqîn.

Serpêhatîbû di panavên kurte-pista şet de belû dibû, şûnşopa rondikên şerminî yên hevaline westiyayî di mijankê zindanê de, bi tevzinokan, bi gulhinar û gavên buharê, radixist. Şevê kirasê xwe li te dikir û li nik pencereyên xulmaşbûyî kulîlkên bêrikirina te diçirîsin. Li ser bitanokên lêvên yên wekû eşekê, refên qulingan diketin naveroka aramê. Pinpinikên kenê te nêzî zordestiya demê nedibûn, lêbelê stiranên êvarê yên bêrivanên bergirêdayî, bi şohiyên çavliremanê ji keftelêfta te diherikin, taristana çirokên te, jena bihokan û tovên evîne di pirozbahîya laşê te de dibişkivin, weke gerdenikekê ji êgir tu seranserî xewnê dixemilandi...

Tu kevoka eşê bûyî... Tu behîşt û dayika griye bûyî.

Serpêhatî bû... û gunehkariya ZÎNÊ li ser eniya şevîne ya Birca Belek bi pênûsa zikreşîya Beko hatibû nivisandin, SÎRWAN bi cangiranî destên xwe yên kesk û berfireh, ji himbêzkirina elinda (şefa) hevdîna te, dide alî û dilê me yê dorpeçkirî bi toza şûnwaran li ber girmijîna xwe digindirand, bi tiliyên ava hişîn biranîna me dihûna.

Ez bi bîna te dihatim dagirtin, keskesorek di dimenên bajêr de diçilmisî. Min gula berbero bi agirê nava xwe haş dikir, min bax û bîstanên te, ebrû û kildanên te ji bilêvkirîne bernedida, lê tu dihati, mîna hehecîkekê te xwe li ser şaxên xwîna min datanî, firîşteyêke birindar, hevaline windabûyî, bas-kên te ji şiniyên mezin in, evindarê te dilmeşt e, li ber dergeh, dergehê paytext û bajarên dijwar, ji serpêhatiya te diniqute û xêzên bengîniya te asoyeke lajwerdî diafirînin, û ez jî, qunax û nalinê, rêçan û xatirxwestinê di hişê te de dimeyînim.

Gava ku min pesnê te bi şirava gulân, dida

Tu li gel min bi zimanê birîna xwe diaxivî...

Tu ji qizani diketî di livîna tirsê de radiketî Min govenda mêraniyê lidardixist û pîrê, pîrsa min di konkê xwe de dirist...

Li navnişana te kerr û gêj bûm Dema ku şevê ferhenga xwe guvaşt min tu nas kirî Di berbanga çavê te de, gelawêj bûm...

Ku ro hildihat serpêhatî har dibû Ku ro diçû ava Raperîna canê te jar dibû...

hevalan dest bi dastana girî dikin, biranînan radixînin û dengê Nasîrê Rezezî ji ewrên matmayîne yên li ser serê me, diherike. Bixçika gazinan li ser milê te ye, bajarê me yê şewitî di reşka çavê te de û bi hezaran pîrs li ser lêvên te şiyar dibin û ji nişkê ve dilê min di nav destên te de dilerize.

Bîla gulên vî welatî tev ji boyî te bireqîsin û gulek ji rengê axîna te, ji oxira min re bibe kefen...

Evîna te bager bû Lewra ji dara bendemana te diweşiyam... Her roj dimirim Her şev min di goristana xewna te de vedişartin... Weke kulîlka hinarê

min de çeng dibûn, û mîja bêreng ya ku di henasa hevîne de dipêliya, dilê min dikir du felqe, kulên min belav dibûn li ser hingivînokan, tu mêşa hinguv bûyî, te berê min û xwe dida kewarên nalîna sermedî.

Her ku dara tûyê dipeyivandin serpêhatya me li ser zimanê wê bû. Her ku ewrekî giran ji bezê binçikyayî dibû Tirên xwe yên avîni dibarand û hinarkên zevîyan, biskên serpêhatiya te mist dida. Û her ku ez û tu di gulistana serpêhatiyê de hinî şirava gulân dibûn Zengilên penagehan em agahdarî zuhayê dikirin.

-IV-


Li ser doşeka nermîn ramedandî bû, diwarên paşerojê re dipûnîjî, bi şujînen çavê xwe pêseroj qul dikir, ji qulên zivir dişemîtî anuhayiyê.

Serpêhatiyê mîna birûskeke di hişê wî de veda... Pirsên hebûn û nebûnê ji pêxêra xwe berda... Bi kotekî şevê ramana wî û berbeyanî za... Xwe hilgirt, hişê xwe girt û bû neviyê ba... Hiv di çavên wî de raketin, Anuhayiyên bedew ji moxila serê wî derketin, Ji gula dilê wî cejn û awaz ketin, bû kat, bû barbat û serpêhatî ne çû ava...

Ez û tu ne, RONO di nav me de sinorekî serserî ye, û keziyên te bi derbişkêve re êrişî cergê min dikin. Lîlandîna te dibe rivîn û bi kulîmekên gerdûn dikeve. Çirokên te bi çeperan, bi term û şinan mişt dibin û banga axê, axa ku bi rûyê evîndaran hatiye nixumandin, ji te dest pê dike.

Serpêhatî ye... Ji gera zimanê zemîna dûr e Serpêhatî ye, xwîna çeleng e, herdû layên şûr e

Serpêhatî bi çîyan re dibişirî, ji zimanê şevbuhêrkên malkambax baz dida, di oxira şehîdan de çirokbêjiya xwe dimeyand, û herdem bejna te xetîreya karwanan bû. Em ji xulxulandîna giyanê te der dibûn û serpêhatî di elfeba ya me de şîn dihat.



Di vê bihara bê hinar de Ez li ser şaxêr bêrikirina te dibişkivim...

-II-

Û serpêhatî li ser diwarê hemû istgehên belav dibû. Diwarên herifî yên kêlikên mêrkuj û dayikên xemgîn herdem nişana gulvedana te ne. Zînge zînga gavên te di kolanên laşê min de, çûkên destê sibê bi bizava dara tûyê re, tinin bira min. Hişê min di ser dev re diçe bi çirokên te û tîna peyvên te ji xwe re dikim balgeh, helbesta jiyana xwe ji şekirrejiya lêvên te hildibijêrim û berzûrî xwedanê nêrina te dibim.

Serpêhatî ye di guldanka demê de bi xwîn û xwedana me, bi vîn û renckêşana me hildiperike bêden-giya zizbûna şevê.

Ez û tu ne, li balafirxanan hev wenda dikin, li odayên hevîyên

Ez û tu û serpêhatiyên weke demsalekê werzên bizdayî di nava me de derbaz dikir. Me kûrbûna xewrevîne bi bejna şevê dipîva, û min navê te bi mijankên xwe dugvaşt ta ku toza mirinê ji ser çavên xwe bişom. Zaroka te bûm, serê min li ser çoga te ye, min bilorîne...min biloooo...riiiii...neee û serpêhatiyên weke xetireyekê di kezêba min de raçikin e...

-III-

Û parsûyên serpêhatiyê bi hingivandîna te diqirçiyên. Te kuleka zaroktiya min vedikir, te reng û tama pincarên bira min jiber dikir, sitirizerk û gûnpisik di çermê

(Me di havîne de dest bi rêwitiya kir. Kirasên jinan pir di şinahiyê de çirîsin, û em ji mêj ve li hespên xwe siwarbûyî ne. Bê guman wê payiz bê, bi kêmanî, li wîra, jin in xemgîn here ku navên me nasdikin...M- RÏLKE.)

-V-

Dilekî min di pencerê de bû Dilek li ser kolanê bû

Roj diçû ava, hildiperikî diwaran Sibera te diterikî Kirasekî sor... Hevalên bi bîna tûtîne... Helbestine sergerdan... Şev ronahiyê ji pencên xwe ber dide Li ba dibe, Ji nûve, bi bîna kulîlkên bejî bi oksijîna serpêhatiyê, dijene.

Bersîva rojnamevanekî "çav mezin û guhdîrêj"

Vahap Kumruaslan

Di rojnama Welat de ev sê carin (hej 14, 21, 22) ku merivekî buhtankar di bin xêliya navekî derewîn de (camêr navê xwe kiriye J. Diyarbekirî) xwe veşartîye û bi uslûbeke ne siyasî, bi zimanekî bê sewiye bela xwe di min û hin dost û hevalan dide. Ji min û hin hevalên YEKBÛNê re gelek gotinên bêsewîye dibêje û "nav û niçokên" nemayî li me dike. Ji min re dibêje "sekreterê sekreteran", "peyayê xelkê", "mahlûqê herî sadiq" û "lawikê naxirvan". Bûyera ku ez ne di nav de bûme min dixê nav, gotina ku min negotîye bi min dide gotin. Bi kurtayî ji bo ku ew, min û hevalên din biçûk bixîne, şexsiyeta me rencîde bike her derewê dike, her buhtanê mubah dibîne.

Nivîsa pêşî min pîrr guh nedayê; min got: "her rexne ne hêjayî bersîvê ye" û meriv nikane "xwe bi ber teqala her kesî xê". Lê piştî ku du nivîsên din jî lê pê hev bi vî uslûba bêsewîye derketin, êdî nedibû ku ez bêdeng bimînim. Divê ez û vî rojnamevanê vîrnî li hember xwendevanan deqên xwe li hev xin.

J. Diyarbekirî xwe rojnamevan dihesibîne, dibêje: "rojnamevanî ne karekî hêsane, divê çavên meriv vekirî û guhdîr meriv dirêj bin". Yanî muhatabê min "rojnamevanekî çav mezin û guhdîrêj" e. Ez çî bibêjim?! Xwedê meriv ji bêtarên girantir bisitirîne...

Li pê aferimê ye

Bi qasî ku meriv ji nivîsên vî "rojnamevanê guhdîrêj" fahm dike ya ew dixwaze xwe bi hin deran şîrîn nîşan bide, ji bo ku jê re bibêjin "aferim", ya jî raste rast ew ji alî hin kesan ve hatiye kirêkirin. Bêyî armanç û wezîfeyê wîha ez tu maneyekê nadim van nivîsên bêsebeb, tije xêber û heqaretên şexsî. Çimkî ez difikirim, di van demên nêzik de tu bûyereke ku J. Diyarbekirî hewqasî biqehirîne, hewqasî êrîşkar bike çê nebûye. Ne min û ne jî hevalên din me tu neheqî ya jî heqaret li merivekî bi navê J. Diyarbekirî nekiriye. Û jî xwe ew bi xwe jî li ser hevdîseyekê konkret nasekine, di warê îdeolojîk yan jî siyasî de tu munaqeseyekê bi min û hevalên din re nake; li ciyê re-

hetiyê gotinên bêmunasebet dibêje û henekê xwe bi me dike. Lê çima, ji bo çî? ev ne diyar e. Lema jî, bêyî ihtîmalên jorin min tu sebebeke din ji nivîsên J. Diyarbekirî re nedît.

Her çiqas ez J. Diyarbekirî nas nakim jî lê xuyaye ew, min û kesên din ên ku ew henekê xwe bi wan dike, baş nas dike; heta dizane çî "risim" bi dîwarê mala kê de bi dardekiriye. Yanî ew "mûbîrekî ji malê" ye. Mumkun e ku li bajêr yekcar em rastî hev jî tîn û silavê jî li hev dikin. Ez meraq dikim, gelo di wê bîstîkê de ew li ber xwe mîze dike ya na?

Bi ihtîmaleke mezin wê sicîla siyasî ya J. Diyarbekirî pîrr ne paqîj be, wê gelek çiv û teqle tê de hebin. Heger ne wîha ba wê di vî munaqesê de navê xwe yê ku di nav civatê de ew pê tê nasîn ji muhatabê xwe veneşarta. Wek ku ew me nas dike, divê me jî ew nas bikira.

Naskirina muhatab

Dikane bête gotin: "ma di munaqeseyê siyasî de naskirina hev muhîm e?" Heger munaqeseyê fikrî be, siyasî be, bê guman ne hewce ye ku meriv huwîyeta muhatabê xwe bizanibe. Ya muhîm, tiştê tê gotin, tiştê tê parastin e. Lê wek numûna J. Diyarbekirî, gava munaqeseyê ne munaqeseyê fikrî û siyasî be, ne li ser bûyereke konkret be, tiştên tîn gotin giş çêr û tinaz û heqaretên şexsî bin, helbet wê gavê naskirina muhatab gelekî muhîm e. Heger emê li ser şexsiyeta wî baweriyên hev bipiyvin, ma ne divê em hev û du nas bikin. Divê em bizanibin ka "kî" do çibû û îro çiyê?

J. Diyarbekirî li ser bîr û baweriyên min ya jî li ser nivîseke min tiştêkî nabêje. Ji ber wezîfa girtiye ser milê xwe, dixwaze min rexne bike, lê çavê wî nabire, zanîna wî tîr nake. Îcar radibe henekê xwe bi min dike, navê min çewto mewto dinivîsîne, ji min re dibêje, nizanîm "çentehilgirê" kê.. Ji ber ku ez wek hinekan salê carê partiyekê, fikrekê naguherînim tinazê xwe bi min dike, min dike "mahlûqê herî sadiq" û hwd.

Herçî tarîxa min a siyasî ye ez ji ber pîrr serbilind im. Ez gelekî serbilind im ku ez jî wek hin kesan rojê nabim berdevkê hêzekê. Ez wer "mêran"(!) nas dikim ku her sal dibin amîgoyê hêzekê. Bi

qasî hejmara salên jiyana xwe ya siyasî partî guherandine. Ji borezaniya radyoya TKP (Partiya Komunîst a Tirkîyê) bigre, heta bi KÎPê (Partiya Karkerî Kurdistan), li Tirkîyê û Kurdistanê partî û hêz nema ne ku ev babet mirov nebûbin endamên wan û li defa wan nexistibin. Ji bo van kesan partîguherandin ji solguherandinê hêsantir e. Lê ji tu hêzekê jî bi rehetî veneqetîyan, bi hemuyan re jî rezalet derxistin. Ez dibêjim wê J. Diyarbekirîyê me jî yekî ji van be; wê di tarîxa wî de jî gelek çiv û teqle hebin. Pîrr ne dîr e ku wî jî ji şoreşger û welatperwerên Kurdistan re wek "mîltanekî" TKPê pîrr xeber dabe, gotibe "mîliyetçî" û "bölücü" yanî separatîst. Lê insanên wîha tu carî nabin merivên kesî, ew merivên demê ne û ji fesadiyê pîrr hez dikin. J. Diyarbekirî îro zîma rojnama Welat lê dixê, lê Xwedê zane wê sibe bibe zîmanê kê? Bi xêr, çaxa J. Diyarbekirî maskeya ber ruyê xwe danî, ezê secera wî hîn firehtir raxim ber çavên xwendevanan.

Buhtan

Xwedêgiravî J. Diyarbekirî xwestiyê YEKBÛNê, min û hevalên din bi uslûbeke mîzahî rexne bike. Lê di hersê nivîsên xwe de jî nîşan daye ku di vî warî de ew bê qabîliyet e. Ew nikane bûyereke mîzahî rexne bike. Dêlî vî ew, ji ba xwe hin tiştan çê dike û li gor dilê xwe hin tiştan dibêje. Bi vî yekê jî ji alîkî ve ew, nezaniyê û bêqabîliyetiya xwe nîşan dide ji aliyê din ve jî ew li muhatabê xwe buhtana dike. Mesela, di nivîsa li ser kongra Federasyona Komelên Kurdistan li Swêdê de (hej. 14) ez wek şexsekî di dîwanê de nîşan dame, ku ew jî bin de derew e. Ez ne di dîwanê û ne jî di organeke din de bûm. Ev jî nîşan dide ku derdekî wî bi min re heye, ne ku di bûyereke qewimî de li ser rola min disekine.

J. Diyarbekirî ne tenê merivekî bêbext û vîrek e, her wisa ehlaqê çapemeniyê jî pê re tune. Çimkî ew bi zanîna derewan dike gava dibêje kongra YEKBÛNê li Stockholmê çêbûye. Ma ew nîzane ku kongra YEKBÛNê li Kurdistanê çêbûye; ne li Stockholmê? Bê guman wek "îmana" xwe dizane? Lê ji bo ku wê yekîtiyê pîs nîşan bide, biçûk bixîne her babet îftîre û tezwîrê mubah dibîne, bi zanîna rastiyê tahrîf dike. Di lîteratura siyasî de navê wê jî bêehlaqî ye.

Ji bo parastina Şiiyan paralela 32'yan

Emerika, Îngîlistan û Fransayê bi bîyareke mûsterek dan îlan kirin ku bi armanca parastina Şiiyên li başûrê Iraqê, ji roja 27.08.1992'an pê ve wê nehêlin balafir û helikopterên Iraqê li başûrê paralela 32'an bifirin. Li gor bîyare, eger balafir û helikopterên Iraqê ji paralela 32 ber bi jêr bifirin, wê ji alî hêz û balafirên hêzên mutefîkan ve bîn xistin.

Li gor beyana serokkomarê

Emerîkayê George Bush, "heta ku pêwîst be" wê ev bîyara wan dom bike.

Her weha, welatên mutefîk didin diyar kirin ku eger ev tedbîr tîr neke, wî heqî li ba xwe dibînin ku "tedbîrên din jî" bigrin.

Piştî îlankirina bîyare, Iraqê tevî ku got ku "em guh nadin" tiştêkî weha jî, lê balafir û helikopterên xwe ji deverê kişandin û tu teşxela derne-

xist.

Serokkomarê Emerika George Bush, di civîna presê de da xuya kirin ku armanca wan ji bîyare, bi tenê parastina Şiiyan e, ne perçekirina Iraqê ye.

Wek tê zanîn berî nuha welatên mutefîk ji bo parastina Kurdistan ji êrîşên Iraqê bi bîyarekê jora paralela 36'an ji Iraqê re qedexeyê kiribû.



Weşanên Nuh



Amadekar: Rohat


Îngiliz Belgelerinde Kürdistan (Di Dokumentên Îngiliz de Kurdistan), Ahmet Mesut, 288 rûpel, Weşanxana Doz, Stenbol, 1992.

Di nav rûpelên vî pirtûkê de gelek dokumentên ku li ser Kurdistan û Kurdistanê çîh girtine, dokumenta pêşîn di sala 1918'an, dokumenta dawîn jî di sala 1958'an de hatiye amadekirin, bi vî tehrî pirtûkê dokumentên ku nêzkaya 40 salan de hatine nivîsîn, pêşkêş dike. Pirtûkê bi pêşgotîneke Ahmet Mesut dest pê dike, wî wusan jî hemû ev dokumentan ji zîmanê Îngîlîzî wergerandiye zîmanê Tirkî.



Wakayiname (Nivîsên li ser Bûyeran), Musa Anter, 238 rûpel, Weşanxana Pelê Sor, Stenbol 1992.

Musa Anter hemû nivîs û hevpeyvînen xwe yê ku di navbera salên 1987'an û 1991'an de di kovar û rojnameyan de çapbûyî, aniyê di vî pirtûka xwe ya nû de berev kiriye. Hemû nivîs û hevpeyvînan angorî salên çapbûyî hatine rêz kirin. Piraniya nivîsên wî li ser rewşa Kurdistan in.



Mazlum Halepçe (Halepçeya Bêgune), Müstehîr Karakaya, 88 rûpel, Weşanxana İslamoğlu, Stenbol, 1991.

Çawa tê zanîn piştî bûyera Halepçe gelek berhem li ser vî bûyerê hatin nivîsîn, wek helbest, bîranîn, bend û nivîsên mayîn. Vê carê bûyera Halepçe bûye babeta romanekê, ev cara pêşîn e ku romanek li ser vî bûyerê tê nivîsîn. Her beşeke romanê bi gotîneke navdar ve dest pê dike, wek "ji mirovên ku tiştêkî wî yê wundakirinê tune be, tê tîrsîn" (Goethe)...




Adım Şeyh Sait (Navê Min Şêx Seîd e), İlhamî Aras, Weşanxana İlke, 133 rûpel, Stenbol, 1992.

Di van salên dawîn de li Tirkîyê li ser bûyera Serhildana Şêx Seîd (1925) gelek pirtûk, lêkolîn hatin nivîsîn, wek pirtûkên Uğur Mumcu (1991) û Aziz Aşan (1991)... Di vî pirtûka nû ya İlhamî Aras de li ser dîroka serhildana Şêx Seîd tê sekinîn. Di dawîya pirtûkê de 19 dokument û çend suretên (wêne) navdarên Kurd jî çîh girtine.



Bir Başka Açidan Kürt Sorunu (Bi Çavekî Din Pîrsa Kurdistan), Ömer Vehbî Hatipoğlu, 304 rûpel, Weşanxana Mesaf, Enqere, 1992.

Ömer Vehbî Hatipoğlu wek kesekî dîndar, bi çavekî İslamî pîrsa Kurdistan li Tirkîyê dinexîne û raçav dike. Çawa tê zanîn ev çend sal e dorber û komên dîndar li ser rewşa Kurdistan dîtin û baweriyên xwe bi vekirî zêdetir raberî xwendevanên xwe dikin. Ev pirtûka nû ji neh beşan pêk tê. Di nav rûpelên pirtûkê de zêdetir li ser rewşa Kurdistan ya îroyîn tê sekinîn.



MÎNYATURA ERZİNGANÎ YA KÎ SESERRA 16. DÎ VIRAZIYAYA



Matrakçı Nasuhî (Nasuhî's-Silahî) na minyatura Erzincanî virašta. Matrakçı Nasuh (tarixê mergê yê: 1537) yew 'alimê 'Usmaniyan o. Gelek kitabê yê estî. Kitabanê yê ra "Be-yân-ı Menâzil-i Sefer-i İrâkeyn-i Sultan Suleyman" namedar o. Nê kitabî di topografya û cografya gelek şaristanan û cayan ser o me'lumat esto. Na minyatura Erzincanî zî nê kitabî di ya. Qismê corinê minyaturî di bi herfanê 'Erebki "Erzincan" nuşte. Minyaturî halê Erzincanî yê nızdî 450 serran ra ver misnena (nawnena).

TERSÎ HİNDONÎ

Arêkerdox: Fiylikê QEREBEGAN

Hindon Ekraga Qerbegün* ra wû. Tê ra nuzdî se serrî ver weş biyo. Hindonîni di biray benî. Hindon biraw qît û. Vatişû gore zaf cesaretlî biyû. Zaf iz (zî) xwu ra heskerdox biyû.

Rûcîk cenîyay inî Hindonî nîweş kûna û çend rûc ti ra pey şûna rehmet.

Hindon, merdey (meyîti) yay benû pey kuarîyî arrişî d' nimenû (tamernenû).

Çend rûcî ser di şûnî, biray Hindonî uwnênû veyw (veyv) nîasena, xwu bi xwu vûn "Cenîyay Hindoy nîweşî bî, 'acîb ina se bî cay nîasena?" û wardenû şûnû key Hindonî. Berî ver di veyn donû, vonû:

-Hindo, Hindo! La cenîya tû nîweş bî, nîasena, gelû ina se bî? Ha kûnca ya?

Hindoy tû naştâ donû, daştâ donû (naştâ erzenû, daştâ erzenû), peynî di kenû raşt vonû:

-Biray mi, rîy mi tû ver di sîya wo, cenîyay mi merda.

Biray yî vonû:
-Ek merda la tû meyîti se kerdi?

Hindo vonû:
-Wilay mi şerm kerd. Şar ko vacû "Hindo keye di b', Gûngîr ûme yî hetî gûnî cenîya yî girrewt. Lê mi rî ina zaf kemasî (kemanê) bîni. İnay ser û mi termî yay berd pey kuwarî di nimit.

* Qerbegün (Qerebegan): Nızdî qezay Palî (Pal'o'y) di yew mintiqa ya.

HES VE DESTÊ KAM AME KÎSTENE?

Hetê Vacixe (Oçavîk) de rozê manga juyî nîna çê. Di biray urzenê ra sonê ro ci pinê, hama nêvenênê. Pênîye de eke teseliya xo gurete, teknenê pêyser yêne.

Zeke kunê dewe, nadanê ke hesê ha wo amo kewto wenca. Hur dëna pa nîsenê ro, zonîyê xo sanenê hard, tifongê xo kenê ra derg. Birawo zu vano:

-Vinde ez pi ra nî.

Uwo bîn kî vano:

-Ti vindê ez pi ra nîne.

Tenê ser o lez kenê, hama tawa zuvîn sare nêkenê. O waxt hir dëna pa girpiyê nanê ro ci, nadanê ke hes gir bî, hurênda xo de mend. Biray zuvîni de nadanê, na ra ser o kunê tê. O vano "Mi hes kîst!", uwo bîn vano "Nê, mi kîst!"

Pênîye de sonê lewê binatî, nadanê ke çî nadê! Mêrikû hes nê, manga xo kîsta. Na ra o waxt kî cêrenê ra zuvîni ser, o vano "Manga to kîste!", birawo bîn kî vano "Nê, to kîste!"*

*Biewnî: Dengê KOMKAR, Frankfurt, no: 51-52 (10. 4. 1983), rîperr: 16

WAYA HOWT BİRAYAN

Arêkerdox: O. Wedat KAYMAK

I
Vanî yow (yew) keyneki bî, howt (hewt) hebî zî biray ja bî labrê a nêzanaynî ki biray ja estî.

Rojî keyneki ma xwi ra va:
-Dayê, qey biray mi çini?

Maya ja va biray to estî keyna mi. Howt hebî biray to yî, hinik î filan ko ra.

Keyneki va: -Ez şona jîni hetî.
Maya ja dey rî yew hero herrên viraşt, keyneki gurot wenîştî; va "Heçi, heçi, heçi", şî cay birayanê xwi.

Şî key birayanê xwi ki yewek keye di çino. Eki biray ja xwi rî şî seyd. Keyneki dey rî non-monî jîni hedirma, çî-mî jîni hedirma û xwi nimit. Biray şan di hamey ki heme çîy jîni hazir o. Va:
-Kamî ma rî ino çî hedirnawo?

Birayê şenikî nimajî xwi derêna, hownîya ki yow keyneki vejey û dey rî çî jîni hedirma. O perra gêsê ja tewîştî, va:
-Ti çî ya, çî kara ya?

Keyneki va: -Ez wa şima ya, şima zî biray min î. Ez hameya şima rî nonî (nanî) şima hedirmena.

Biray şenikî keyf kerd, va:
-Hoow, qey ma Ellay ra hinî çî wazenî?

Biray bîni zî şan di hamey, fam kerd ki e, wa jîni hameya dey rî nanê jîni hedirmena. Keyfê jîni zî hame.

Birayan wa xwi ra va: -Wa ma, adirê xwi qet howna (hewna) meki. Owta (ewta) adir çiniko.

Keyneki va:
-Ney iha! Ez howna nêkena.

Keyneki şan bi şan çîy birayanê xwi hedirma. Yow roj a wû pisînga xwi şî banî se[r]. Pisîngî ra va: -Hela şo veyni adirê ma howna nêşîyo.

Pisîngî şî adir howna kerd û yow mira (mura) zengî guroti kuçlanî zerre nay.

Şan di keyneki şî war ki bin di adir çiniko. Va:
-Ez ko xwi rî se ka? Biray mi

şan di yenî, veyşan î.
Hownîyey, ina kerd ki duy (duman) ha yow ko ra yeno. Werîştî vazday, vazday, vazday; şî weyra. Şî hownîyey ki yow pîra howt sera ya û howt hebî keyney ja yî. Her yow keyna ja yow serey ja çokê xwi ser nawo.

Keynanê Pîri va:
-Wîîî, ti kure ra vejeya? Ma ma to biaqiliyo se to piçî ra wena!

Keyneki va: -Ez tikê adir wazena.

Keynekan çindi gizgalikê adirî day bere, va: -De bigî[r], vazdî!

Keyneki adir gurot, vazday şî; Pîri hima xwi aqiley, va: -Hoo, bîya (buya) mêrdiman ewta yena.

Û sere bi keyneki ser na. Tanî ca sere bi ser na, nızdî ja kerd, keyneki şane xwi ra pey vist. Şane ki vist, ay cay dar û ber bî. Heya ki Pîri dar û ber xelisna, ja îro xwi ra pey vist. Îro ki vist, celqî bî. Heya ki Pîri celqî xelisnay, ja sabun (?) vist. Sabun ki vist, newe ra celqî bî. Heya ki Pîri o zî xelisna, keyneki hamey keye resay; şî zerre, pey berî kewti, ber xwi ser o pada.

Pîri hamey va:
-Ez him kena, gim kena, giştâ şadi milisnena (milosnena)!

Keyneki giştâ xwi fekdê Pîri nay, ja milisnay. Milisnay, milisnay, heta şanî ra şî.

Çindi rojî inawa dewam kerd, biray ja hownîyey ki wa jîni roj bi roj şa'têna. Va:
-Wa ma qey ti inawa şa'têna? Çi derdê to esto?

Va: -Derdê mi çiniko.

Derdê xwi nêva. Be'ndî biray şenikî, birayanê xwinê bînan ra va: -Ez ewta xwi dera nana hela ma veynî ina çî da'ba ya?

Biray şenikî xwi dera na, dî ki Pîra Howtsera hamey berî ve[r] û va: -Ez him kena, gim kena, giştâ şadi milisnena!

Pîri ki ina va, keyneki giştâ xwi ja fek a nay. Seni ki giştâ xwi ja fek nay hima biray şenikî türkemanê xwi ver bere da, yow serey ja dera kerd; ver bere da, ay bîn zî dera kerd. Howt hebî serey ja permay.

II

Howt hebî keyney Pîri bî. Biray şî ay howt keyney ardî, xwi rî mare kerdî.

Birayan cenîyanê xwi ra va "şima ganî ina wa ma ra nêvajî 'Linga xwi b'anci xwi ver', wa ma zav howl (hewl) a."

Labrê veyvan wa mêrdey xwi ra hes nêkerdîni. Semedê a ra gama ki keyneki şîni yaban, jîni awka ja dekerdîni meri, owra ronaynî; keyneki ki yaban ra hameynî, a awki werdîni.

Yow roj veyvan mar dekerd merî zerre. Keyneki ki yaban ra hamey, teyšan bîbî, hima meri xwi ser darit, ti ra aw werdî. Senê ki awki werdî, mar şî pîzey ja.

Roj bi roj mar pîzey ja di xişn bi, pîzey ja zî xişn bi; mar xişn bi, pîzey ja zî xişn bi. Veyvan va: -Şima vatîni "wa ma, wa ma", bow wa şima nêweşa gedî ya (homîla ya)!

Lajekî wa xwi ra persay, va:
-Qey pîzey to xişn beno? Ti nêweşa gedî ya?

Ja va:
-Wilay ez nêweşa gedî-medî nîya. Çî mi çiniko, de Hûmay ra pîzey mi xişn biyo, la ez se ka?

Biray hamey pê ser, va "Destê ma nêgênî ma ja bikişî", biray şenikî ra va:

-Ti ja bişo (beri) pey howt koyan di bikişî bê.

Biray şenikî wa xwi giroti berdi pey howt koyan. Destanê jey nê-gurot ki ja bikişo. Weyra yow ca di ronîştî. Biray kurka xwi binê seredê ja nay, dey rî lufî cenay, wa jey witi (xwi di şî). Senê ki witi, jey parçey kurka ki binê serey ja di bi qesna, yow meysi dekerdi lufîya xwi û dar di leqnay; ca di verday, ageyra.

Keyneki xwi aqiley ki koyo îssiz di tik û tena ya û biray ja weyra nîyo. Pîzedo safî ra yow zewti day biray xwi ro, va:

-Biray mi, biray mi! Mela yow teluy marî lingda to ra şêro, mela daru û dermanê to, hekîmê to çinik bo; ez hekîmê to ba, ti bêrî destê mi kwî!

III

Birawo şenik senê ki şono berî ver, teluy marî lingda jey ra şono.

Keyneki zî wardena şona. Şona, şona, raştê yow citêri yena ki ha xwi rî citi ra şono keye. Citêri vano: -Ti çî ya, çî kara ya?

Vana:
-Ez xwi rî yow qula Ellay a.

Citêri ja gêno beno kêdê xwi, vano: -Qey ino pîzey to xişn o?

Vana: -Ez zî nêzana.

Citêri wardeno yow bizi sere birneno, goştê ja qarme keno; dano bere, wena. Linganê ja gêno fineno pirdan, ja leqneno, fekê ja seracêr keno. Yow teştê aw zî bindê ja di roneno. Mar semedo ki pîzey ja di teyšan biyo, cor di xwi verra dano awki; dekweno teştî miyan, teştî pîr beno.

Citêri dano pîro marî kişeno û keyneki roneno. Keyneki weş û war bena. Weyra hinî ja xwi rî mare keno.

Howt serrî piya manenî. 'Eylê (gedey) jîni benî.

IV

Birawo şenik zî geyreno, geyreno linga xwi rî daru nêveyneno. Rojî vanî filan dewi di yow cenêka hekîmi esta. Wardeno şono weyra. Şono berdê ja ver ki gedey ja ha berî ver di kay kenî. Vano:

-Gedeynî, owta yow hekîmi esta, key ja kura wo?

Gedey vanî: -Hekîmi ma ma ya.

Şono key jîni, cenêki dey rî linga jey ber kena, vana:

-Se biyo linga to?

Vano: -İno howt serrî yo ez derdê ina lingi ancena. Yow wa mi bî, mi berdi pey howt koyan di verday. Ez ki ageyraya ino teluy marî linga mi ra şî. Ay zeman o ino zeman o ez geyrena, daru û dermanê mi çiniko. Daru û dermanê mi dest bê to bi.

O ki mesila xwi inawa vano, a vana: -Qey wa to se kerdbi ki to berdi pey howt koyan di verday?

Vano: -Pîzey ja xişn bibi, cenîyanê ma wa "Nêweşa gedîya".

Vana:
-A wa to ez biya. Ez nêweşa gedî nêbiya, mar pîzey mi di bi.

Û a zî mesila xwi heme dey rî vana.

Weyra hinî way û bira miradê yownan şa benî*.

* Na estaneki heway vatişê yew cenîya Qelbîni nusiyyay (Qelbîni yew dewa qezayê Pîranî ya, Dewleta Tirkiye nameyê na dewi kerdo Bozoba).

FERHENGEKÊ DÊRSIMÎ

cêrenê: geyrenê, geyrenî

çê: keye

de: di, dir, der

eke: eki, kî, ku, gi

gir biyayêne: gindir diyayîş

girpiyê nanê ro ci

hama: labelê, labrê, hima

hard: 'erd, 'ard

ha wo: ha, hê, hinik o, ha o, hanik o,

hanik o, honik o, hanî yo honî yo, hinî yo,

hinî yo, nanik o

hes: heş

hir dëna: hur dëna, her diyîni, wir dîni

hur dëna: hir dëna, her diyîni, wir dîni

hurênde: herindi (herrindi), herundi,

hurendi, ca

ju: yew, yow, yo, jew, jû, zew, zu, zû

ke: ki, ko, ko, gi; eke, eki, eger

kenê derg: derg kenî

kî: zî, jî, çî

kîstene: çîstene, kîştîş, kîştîş, kîştîş,

kuştîş

kunê tê: pê kewenî, pê kwenî

lewê...: ley, lê

lez kenê: lej kenê, danî pê ro

mêrik: mêrdek, mordemek, mordmek

nadayine: ewnîyayîş, niyadayene,

ewniyayîş, ownîyayîş, hewniyayîş, wi-

niyayîş, winiyayîş, uwniyayîş, owneyîş,

hewmayîş, hewneyîş, howneyîş,

nê: ney

nîsenê ro: roşenî

o waxt: aw deme, ay deme, aw wext,

ay wext, zeman

pa: piya, piya

pênîye de: peynî di

pi ra nî: pa na (ez pi ra nî: ez pa na)

ci pinê: ci piyenê, ê pawenî, jey pa-

wenî

ra: raye, ray, rey, rêy, hewî, finî, fin,

gilangi, gilongi, donimi, dolimi

roze: roj, roc, rûj, ruj, rûc, ruej, ruc,

roci, rozi

şanenê: şanenê

sare nêkenê: sere nêfînenî (zuvîn

sare nêkenê: yewbînan sere nêfînenî,

tê sere nêfînenî)

sonê: şonê, şonî, şûnî

tawa: teba, tewa, towa, tuwa, toa,

çî, çîwa, çîwa

tenê: tikê, biney, bineyk, binêk

teseliya ... gurete: tesliya ... kewti,

hêviya ... biriyay

tifong: tifing

urzenê ra: werzenî, wurzenê

uwo bîn: aw bîn, ayo bîn, ay bîn, o bîn

zoni: zani, zoni, çok

zu: yew, yow, yo, yû, jew, jû, ju, jo,

zew, zû

zuvîn: yewbînan, yewnan, yobînû,

yewmin, yemno, jewbîna, jûbîni, jumin,

jîbanan, zewmbîni

Musabeqa futbolê

Bi hemû riyên xebatê bawer



Tîpa Lejna Amediyê

(Foto: Armanç)

Tevî xebata avakirina Kurdistanê, çareserkirina problemên aborî û zelalîkirina statuya siyasî û karên din yên rojane, xortên Kurd ji sporê re jî

wext dibînin: Bi helketina avakirin û vekirina Parlamentoyê, li seranserî Kurdistanê Iraqê di navbera taqimên futbolê yên Kurdistanê

de musabeqeyeke futbolê hat amadekirin. Musabeqee hîn dom dike. Taxima ku dibe yekem wê "Xelata Parlamentoyê" bigre.

Armanç: Guherînen li dunyayê, bi taybetî têkçûna sistema sosyalîst, li hêla fikrî ve çî tesîr li îdeoloji û polîtîka partiya we kir?

Dr. S. Şerefkendi: Diyar e ew guherînen li dunyayê pêk hatin, bi taybetî guherînen du-sê salên dawî ku li welatên sosyalîst çêbûn, tesîrek bi mana guherînen li programa PDK-Î nekiriye. Lê teyîd û tehkîda rêveçûna PDK-Î kir. Ez dixwazim piçek ron bikim. Berî her tiştî esasê xeta PDK-Î li ser demokrasîyê ye. Ji roja ku hatiye damezrandin heta îro. Guherînen li welatên sosyalîst çêbûn, girîngî û ehemiyeta demokrasîyê nîşan dan.

Dudu, xeta siyasî ya PDK-Î mesela milî bû. Yanî heqê însanî yê her miletekî ye çarenûsa miletê xwe bi destê xwe bigre. Ev guherînen li welatên sosyalîst dibin bi giştî, nîşan dan ku mesela milî çî meseleyeke heq e û nayê înkarkirinê.

Dîsa pêkhatina dewletên milî li Sovyeta kevin, Yugoslavya û welatên din, siyaseta PDK-Î tayîd dike.

Kurdên Kurdistana Îranê xwe Îranî dizanin

Armanç: Li dervayî welat dema li ser bûyereke meş, protesto, şîn an şahîyê Kurdan çêdibe, heger ne ya Kurdên Kurdistana

Îranê be, mirov wan nabîne. Tu wek serokekî partîyê Kurdîstana Îranê ve rewşê bi çî ve girê didî?

Dr. S. Şerefkendi: Di hevdîtînek weha de gelek zehmetc mirov bi detay û bi rehetî bersîva pirseke weha bide. Lê ji ber ku te pirsîye, ez bersîvekê bidim. Yek ji sedemên wê; hejmara Kurdên Kurdistana Îranê ku li dervayî welat in qet bi hejmara Kurdên Tirkiyê, Iraqê nayên muqayesekirin. Bi giştî muhaceret li Kurdistana Îranê van 7-8 salên dawî, piştî rejîma cumhuriyeta Îslamî hatiye holê dest pê kiriye. Yanî Kurdên Îranê li dervayî welat gelek kêman in. Wek mîsal gava mirov Swêdê nîşan bide, hejmara Kurdên Îranê li gor Kurdên Tirkiyê û Iraqê pir kêman in. Heger di şîn, şahî û protestoyan de beşdar bin jî, ev beşdarbûna wan diyar nake.

Ji ber ku li dervayî welat Kurdên Îranê nuh in, hîn ji ziman û civata wan deran re xerîb in, nakevin çav. Muhacereta Kurdên Tirkiyê û Iraqê ji bo Ewropa bi hindikayî 20-25 sal e.

Di warê siyasî de jî hin sedem hene. Bi giştî rewşa Kurdên Îranê cûdatir e ji Kurdên Tirkiyê û Iraqê. Kurdên Îranê xwe Îranî dizanin. Di warê mêjû, di warê kultur, di warê ziman, musîkî de Kurdên Îranê bi rastî xwe Îranî dizanin. Xwe ji

Îraniyan re jî Kurdên Suriyê nêztir dibînin. Ev rastiyek e. Herê Kurd in lê di warê lehçe de ferqiyet pir e. Ji ber vê yekê siyaseta Kurdên Îranê di çarçeweya Îranê de her otonomî ye. Vajiya Kurdên perçeyên din ku di fikra wan de Kurdistaneke mezin heye. Hemû ev sedem, wê tabloyê derdixe. Lê bawer im wê hêdî hêdî hevûdin nas bikin û nêzikî hev bibin.

Armanç: Tu mesajêke te ji Kurdên Tirkiyê re heye?

Dr. S. Şerefkendi: Kurdên Tirkiyê rewşa xwe ji me baştir dizanin. Kurdistana Tirkiyê, perçeyê mezintirîn ê Kurdistanê ye. 12 milyon Kurd tu heqê wan tuneye. Pir tabîî ye wê ji bo heq û huqûq û azadiya xwe bixebitin. Riya gihîştina heq û huqûqê jî, tabîî ye ku wê Kurdên Tirkiyê tesbît bikin. Lê heger heqê me yê diyarkirina dîtinan hebe, dikarin wê bibêjin: Bi hemû riyên xebatê divê bawer bin û amade bin. Îmkanên demokratîk hebin jî bo têkoşîn, divê bê dayîn. Arzûya min ew e ku tu wext xebat û têkoşîna ji bo gihîştina heq û huqûqên milî dest jê neyê berdan. Lê heta îmkan hebe bi riyên demokratîk û aşî, dema tunebin xwe li hember êrîşên dijmin biparêzin. Û bi daxwaza serkeftin û azadiyê.

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving

1													
2													
3													
4													
5													
6													
7													
8													
9													
10													
11													
12													

qîzan b- Navê cihekî laş.

Serejêr: 1-a- Şahînet, kêf. b- Li 'Yugoslavyayê' navê devera ku Arnavutî lê dijîn. 2-a- Daçekek (berevajî) b- Du herfên dengdêr. c- Kevirê ku li her du rexên goran tê çikilandin. (berevajî) 3-a- Ne kovî b- Eşq. 4-a- Sînonîmeke 'naxweşî'. b- Du herfên dengdêr. c- Dewarek. 5-a- Şefeq b- kûçik c- Derew 6-a- Mêweyek b- Bi Farisî 'agir'. c- Rih. 7-a- Sînonîmeke 'ko' b- Gotîneke şaşmanê c- Hejmarek 8-a- Kesê ku li ber rez disekine û sexbêriya rez dike. b- nexweşiyek 9-a- Cot b- Sînonîmeke 'ordêk'. c- Di Kurmancî de pronavekî kesan. 10-a- Zincîra ku ku pê sto û piyên girtiyan girêdidin. (berevajî) b- Xwêk, wêrgî. 11-a- Paşdaçekek b- Eşîret c- Pê emîn bûn, îman pê anîn. 12-a- Ne tarî (berevajî) b- Li Amerîka Başûr welatek.

Bersîva Hejmara berê

Çeperast: 1-a) Meyrem Xan, b) ak, 2-a) eş, b) etû, c) rawê, 3-a) ebaboz, b) lal, 4-a) dever, b) lîloz, 5-a) in, b) kal, 6-a) Nîl, b) hinar, c) ra, 7-a) şahîn, b) neyar, 8-a) ekliç, b) wa, 9-a) en, b) çî, c) şret, 10-a) şepîrze, 11-a) nû, b) karwan, 12-a) dre, b) raec, c) edî.

Serjêr: 1-a) Mêrdin, b) elind, 2-a) eş, b) enîşk, c) ûr, 3-a) ev, b) Laleş, 4-a) reben, b) hinek, 5-a) etar, b) hiç, c) par, 6-a) mûb, b) kin, c) çira, 7-a) olan, b) sirwe, 8-a) Zilan, b) zac, 9-a) nr, b) Rewşen, 10-a) aloz, b) yar, c) kê, 11-a) awaz, b) ra, c) ud, 12-a) kêl, b) sar, c) taji.

Çeperast: 1-a-Li Kurdistana bakur bajarek ku di meha Tebaxê de leşkerê Tirk êriş bir ser û bajar vala kirin. b- Serbestî, huriyet 2-a-Beyreq. b- 'Ebd. (berevajî) c- Dengvedan, ekis 3-a- Heywanekî kovî ku sîxên wî hene. 4-a- Qedeh, şîşa çayê. b- Bajare ku parlamentoya Kurdistana Iraqê lê ye. 5-a- Paytextê Iraqê b- Xwendina herfekê. 6-a- Sînonîmeke 'din'. b- navê giyayekî 7-a- Dînî b- Ale-tê ku mirov tiştan pê serad dike. c- Navê nexweşiyekê. 8-a-Hejmarek b- rengê c- Karika ku li maka xwe nabane. 9-a- Navê kesê ku bûye se-

bebê serê Mem û Zînê (berevajî) b- Navê kesê efsanewî yê Newrozê, kesê ku Dehaq kuştîye. 10-a- Kesê muhtacî avê, têhnî (berevajî) b- rex, ba, nik. 11-a- Terefdar, tagir b- Bi soranî 'av'. c- Kok, rih. 12-a- Ji navên

Dewletê Şîrnex wêran kir

meke dewletê li wan nebûye, wek artistan ji xwe re rol dikin.

Her weha parlamenterên HEP'ê yên Şîrnexê, piştî gera li Şîrnexê, bi telegrafekê ji Sekreterê Giştî yê Koma Miletan Butros Galli daxwaz kirin ku heyetê bişîne Şîrnexê. Dîsan roja 26'ê mehê li parlamentoya Tirkiyê li ser bûyerên Şîrnexê civîn çêbû. Parlamenterê HEP'ê Mahmut Alinak jî ber ku got: "Hukûmeta Fermandariya Eserî ye", ji ser kursî bi zorê hat bi dûr xistin. Gelek parlamenteran bi hev re êriş birin ser û gotin: "PKK vaye di Meclîsê de ye. Bi vî hawî nehîştin M. Alinak bipeyive. Yanî divê Kurd ne li Meclîsê û ne jî li derî Meclîsê dengê xwe nekin:

Heta roja ku Armanç ket çapê jî, ji esker, polis, û milîsên (qorucu) mala Elîxan Tatar pê ve kes li Şîrnexê nemabû. Dewletê ji bona ku wehşeta xwe ya li Şîrnexê wek xweparastîneke mecbûrî nîşan bide û siyaseta xwe ya şidêlê bi bir û raya giştî bide qebûlîkirin, heta jê hat êrişê PKK'ê mezin nîşan da. Bi riya rojname, televîzyon û beyanên Wezîrê Hundîrkar û Waliyê Herêma Rewşa Îstîsmayî, gçh got 500, gçh got 1000, gçh got 1500 milîtanên PKK'ê êriş anîne ser avahiyan eskerî û resmî.

Argumentên dewlet nîşan didin helbet ne rast in. Berî her tiştî êrişên PKK'ê yên ser avahiyan eskerî û resmî ne nuh e. Çî heta nuha û çî jî piştî êrişê Şîrnexê be PKK'ê gelek carên din jî êrişên wiha kiriye. Yanî êrişê Şîrnexê ne tiştê nuh e, tiştê "nuh" siyaseta û şiklê bersîva dewletê ye.

Lê li aliyê din, PKK'ê jî wek gelek caran li ser êrişê xwe beyanên li dijî hev dan. Carê got 'erê me kiriye û emê bikin'. Car got 'ne me êriş nebiriye, ev provakasyona dewletê ye'. Tê zanîn ku rojnameye "Ozgur Gundem" ku nêzî PKK ye, di 21'ê mehê de nivîsî ku: "PKK'ê di 18'ê mehê de avêtiye ser Şîrnexê û avahiyan Emniyet û Fermandariya Eserî daye ber gulleyan." Li Ewropayê jî berpirsê PKK beyan dan û gotin ku "em ji bûyerên Şîrnexê agahdar in". Lê piştî pênc rojan, serokê PKK'ê Abdullah Ocalan beyanek da cynî rojname û got ku: "Gerilayek bi tenê jî neketiye Şîrnexê."

Her weha parlamenterê HEP'ê Mahmut Alinak di radyoya BBC de li ser bûyeran weha peyivî: "Hêzên dewletê li Şîrnexê çar tax xirab kirine û ji xelkê jî bi sedan kes hatine kuştin. PKK'ê do êriş birîye ser Şîrnexê û piştî paşde vekîşiyaye. Dûre hêzên dewletê

êriş birine ser xelkê bajêr."

Ji ber ku hesabê mal û bajêr li hev derneket; hem ji alî madî, hem ji alî manewî zirareke mezin gihîşt gel û bajar jî bi tevayî vala bû, loma jî PKK li êrişê xwe xwedî demakeve. Wek bûyera Newrozê, dibêjin: "ne em in".

Li alî din, roja 27'ê mehê di bin serokatiya Turgut Ozal de û li ser pêşniyara wî, Konseya Ewlekariya Milî û hukûmeta li Diyarbekirê civiya. Di dîroka Tirkiyê de ev yekem car e ku Konsey û hukûmeta civîna xwe li bajarekî Kurdistanê çêdikin. Bi vî civîna xwe dewletê xwest ku zorbayîya xwe nîşan bide û çavê gel bitirsîne. Piştî civîna, di beyana civînan de hat gotin ku: "Welat û miletê Tirk nayê perçekirin. Wê dewlet heta li dervayî sinorên Tirkiyê jî, li her derê here ser terorê." Li her xebere jî deverê tên, piştî civîna Diyarbekirê gelek esker bi çekên giran ve ber bi Şîrnex û sinorê Iraqê ve çûne. Balafirên Tirk car din erdê Kurdistana Iraqê bombabaran kirin.

Ji beyanên civîna Diyarbekirê xuya dibe ku wê hukûmeta û dewleta Tirk êrişên hovtir bine ser gelê me û ev êrişên wan, wê sinorên Tirkiyê û Kurdistanê derbas bike.

nameyên xwendevanan

"Kaşkaşokapaşpaşok" û "Çerxesyar"

Birayên hêja!

Hemû hejmarên rojnameya we bi bînekê ve tîn xwendin û mirov gelek tiştên xweş jê hiltûne. Di hejmar 122, di Beroşê de gotina "Kaşkaşokapaşpaşok" nimûneyek e baş e ji bo kesên ku bi navê paqijkirinê zimanê me pîstir dikin. Lê di rûpelê 9'an di "Hindik-Rindik" de we gotiye ku "Kûçik mir." Bi baweriya min we zimanê me yê dewlemend jar kiriye. Ji ber ku kûçik namire, lê 'disekite'. Ango ga 'gever bû', mirîşk 'hişk bû', hesp 'banz da', deve 'ix bû', 'kûçik sekiti'.

Em bixwazin nexwazin, carna mecbûr dibin ku termîna çêbikin. Lê divê usa çêkin ku angorî qanûnên zimanê me be. Bo nimûne herî çend salan me termînek nuh çêkir: 'Çerxesyar' (bisiklet). Ev

gotin nuha usa ketiye nav zimanê me û bûye Kurdî ku em bi zorê jî bixwazin derxin, dernayê. Lê me gotinên usa jî çêkirine ku heta nuha jî nebûne milkê gelê Kurd.

Şaşî, xeletî ew e ku dewsa em gotinên wek 'buhuşt, dogeh, alîkarî, nuh, gotinên wek 'cînnet, cîhennem, komekdarî, teze' bi kar tînin.

Dawiyê ez dixwazim bibêjim ku kêmanîke redaksiyona we ew e ku gava hûn gotara çap nakin, bersivê jî nadin. Ji bo nimûne, min 3-4 gotar şandin, lê we ne çap kirin, ne jî bersiva min da. Çapnekirin tiştê normal e, redaksiyon dikane destûra çapnekirinê bide, lê bersivnedayîn ne normal e.

Timûrê Xelil Mûradov

Çend gotin li ser rewşa Bakurê Kurdistanê

Bi hatina cuntaya eskerî re li Turkiyê û li Bakurê Kurdistanê gelek guhartinên nuh, bi taybetî bûyer û netîceyên ji Kurdan re gelek xerab peyda bûn. Li aliyekî din jî hinek netîceyên ku ji Kurd û Kurdistanê re baş in jî çêbûne. Lê ez dixwazim li vir bi tenê qala netîceyên ku xerabî bi xwe re anîne bikim.

Xerabiya herî mezin, tofana herî giran bi baweriya min ji Kurdistanê koçkirina Kurdan e. Bi sedhezaran, bi milyonan Kurd îro jî cî û warên xwe bi dîr ketine û li bajarên dewletên dijmin bi cih bûne. Hebûna xwe di cî de hiştine û xwe avêtine tor û bextê dijminên xwe. Ev bûyera ha daxwaza dijminê Kurd bû, ku bi zor û zordestiya deh salan bi ser neketibû. Kemal Atatürk ê Makedonî bi qanûnên xwe yê zordest di destpêka damezirandina Cumhûriyeta Turkiyê de û bi gelek awayên nemirovî ku li Kurdên Bakurê Kurdistanê jî bo asimîlekirina wan dimeşand, di van şêst salên dawî de hewqas Kurd nekirin der û asimîle nekirin.

Xerabiya düyem jî pîrbûna nezanan, nexwendevanan û reva kesên zana ji Kurdistanê ye. Bi tu zimanan zarokên Kurd êdî naxwînin, dibistan bi zimanê Kurdî hê qedexe ne. Xortê Kurd jî nezani û neçariya xwe direve diçe bajarên mezin, dibe koleyê xelkê.

Bakurê Kurdistanê di tu deman de û di nava deh salan de tu carî hewqas zerar neditiye. Heger bi xurtî pêşiya vê tofanê neyê girtin, wê piştî çend salan Bakurê Kurdistanê ji Kurdan vikûvala bibe û yên mayî jî wê asimîle bibin, bibin Turk. Ji xwe niha piraniya Kurdên li roavayê xeta Reha-Diyarbakir dimînin bi Tirkiyek xerab dixivin û ji xwe, xwe Kurd hesab nakin. 15 milyon Kurdên qala wan di belavok û rojnameyên partiyên de tê kirin bi rastî pênc milyon jî neman. Hejmara bajarên Kurdistanê jî di rastiye de maye çend bajarên li rojhilata Turkiyê. Bi baweriya min miletekî ku zimanê xwe windakiribe êdî xwe tevli şerê serxwebûnê nake û heger rojekê dengdanek çêbibe jî wê rîya hêsanî bigre û xwe li ser Turkiyê bihesibîne. Hingê wê nexweşiya Bakurê Kurdistanê jî sisiya yek bimîne. Ew yek jî wê heta Kurd û siyasetên wan bi dehan sal nûnin û komikan çêbikin wê jî mirovan xalî bibe. Tev wê birevin herin cihên xweştir. Hingê emê Kurdistanê jî kê re azad bikin, çaxê gelê wê jê reviya be?

Bi hêviya ku Kurd zûtir ji xewa xwe ya giran şiyar bin û pêşiya vê tofana bi serê Bakurê Kurdistanê de hatiye bigrin, da ku wek gelên din yên ku serxwebûna xwe bidest-xistin ew jî di vê sedsalê de bibin dewlet. Yekîti, hevgerî û xebat li Kurdistanê rêka wê ye.

Bareş Bettê

BEROŞ



Mahmûd Lewendî

ÇEND NAME JI XWENDEVANAN

Ji ber çî sedemî ye ez nizanim, lê van rojana virrîna nameyan e di ser serê me re û di ber guhên me re derbas dibin. A ha ji we re du nimûne ji wan nameyên virvirîni.

Name-1

Ev serê bîst salan e ku li Swêdê me. Dikana min, tirimbêla min û xaniyekî min heye. Ez dixwazim bizewicim. Emrê min 44,5 e. Qama min 144,5 e. Giraniya min jî 44,5 e. Porê min hîn neweşiyaye. Lê divê ez rastîyekê bibêjim ku çend tayên sipî ketine nav porê min, lê tişt nabe ezê bi boyaxa Awrupayê boyax kim.

Li benda boyaxa we, pardon bersiva we me!

Hevdesipî Limalmayî

Name-2

Rojnûz baş olsun ey kovar-î Armanc'în Beroş namiyle namîdar quncikîyle xebat eyleyen hevaller.

Bendenîz zikmak dilî Turkçe olan bir Turk um. Ji ber vê yekêden dolayi, mecbûren sîze Türkçe nivîsîyorum. Hêvî we ricam odur kî bû name-yî xwendevanîmi zimanê Kurdî'nîn Kurmancî lehçesîne wergerlesenîz zêde memnûn olûrûm.

Çimkî ben çox fikirledim, baxtim kî Turk çepin de bir xêr yoktûr, ji ber wê sedemêden doleyî onlardan devjêberdan eyledim we şimdî de daxwazim Kurd çepine nêzik olmaktır.

Her cûre kar û bariniz de serkevî olmanîzi Xuda-yî alemden daxwaz eyley ve şimdiden dil û can ile tum sipaslarimi pêşkêş eyleyîm efendim.

Selamlar efendim.

Alper Şoreş

NE GOTINÊN NAVDARAN LÊ YÊN NAV DARAN

- Eskimoyî qûlên (evd) Xwedê yên qeşagirtî ne.
- Cixare zerarê digihine sihhetê, sihhet jî zerarê digihine cixarê.
- Her ku însanan nas dikim, ji heywanan bêtir hez dikim.
- Ya rebbî sebrê bide min lê piçekî zû!
- Qedexekirin qedexe yel
- Bimre nan û pîvaz, bîjî goşt û birinc!
- Kes ji teraliyê nemirîye.
- Karê zengînan pere qezenckirin e, yê feqîran jî hesabkîrin e.
- Bekarên hemû welatan dev ji kar berdî.
- Ger hêk li te dikeve, tu ji li mirîşkê keve.
- Ger tu cixara xwe di qedeha çayê de vedimirîni, çaya xwe jî di xwelidankê de vexwe.
- Her ku nivîskarên me nas dikim, dixwazim bi-bim xerrat!

GER PARAŞUT VENEBE

Mêrik li dikana paraşutçî ye, dixwaze paraşutekê bikire. Paraşutekê di'ecibîne, paşê jî dikandar dipirse:

- Baş e, wexta ku ez xwe ji tiyarê bavêjim û ev paraşuta venebe ezê çî bikim?
- Dikandar:
- Wê wextê bîne emê biguherin!

JINA WÎ DU ZAROK ANÎNE

Memûr ji mudirê xwe izin xwest, ji ber ku jina wî wê biwelide. Mudir du roj izin da memûr. Memûr piştî çar rojan hat kar. Mudir jê pirsî:

-Min du roj izin dabû te, tu çar rojan nehatî, çima?

Memûr:

-Belê mudirê min, lê jina min du zarok anîn!

ne karê aqîla ye lê rast e

Amadekar: Hesên Mizgîn

Marmaroka herî mezin li Endonezyayê ye. Dirêjahiya vê marmaroka han digihîje 3.65 M. û giraniya wê jî 150 kg. zêdetir.

Roket û keştiyên xurde yên li asûmanê jî bo seychatên nû talûkeyeke mezin in. Perçeke biçûk ji van xurdeyên li asûmanê dikare qulek mezin di keştiyên din de veke û xisareke mezin bide wan.

NASA li DYA bi direktîfa George Bush plan û programa çuyîna planeta

Marsê amade dike. Li gor direktîfa Bush divê Amerîkî di 50 saliya çuyîna hîvê de astronotên xwe bişînin Marsê. Amerîkî cara yekemîn di sala 1969'an de çûbûn hîvê. Li gor hesabên Nasa'yê ew ê di sala 2019'an de biçin Marsê.

Îro li dinê insanê herî giran ji Florida'yê T.J. Albert Jackson e. Giraniya wî 400 kg, qaliniya dora sîngê wî 305 cm, dora zikê wî 294 cm, û dora qorika wî 178 cm ye. T. J. Albert Jackson di zayina xwe de ji giran bû. Di sala 1941'an de ku nû hatibû dinê 9970 gram bû. Helbet A. Jackson di diroka dinê de ne yê herî giran e. Walter Hudson 485 kg, Michael Walker 538 kg û Robert E. Hughes 485 kg bûn û hemwelatîyên A. Jackson bûn.

Lêborin! Em ji xwendevanan û ji amadekarê quncika "Ne karê aqîlayê lê rastê" daxwaza lêborinê dikin ku di her du hejmarên dawî yên Armancê de eynî tekstên quncikê derketine.

Armanc